PÊNÛSA NÛ
Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê
شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا
rojnameyeke çandî ye ji weşanên Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî ye hejimar '7' çilê pêşî 2012

## Arşevê Oskan wefat kir

Malbat û dostên helbestvan û nivîskar Arşevê Oskan bi dilekî xemgîn nûçeya wefata Arşevê Oskan ragihandin. Arşevê ku di roja yekşemê 25.11.2012an de li Hamburg-Elmanya, piştî kêferatek dirêj bi nexweşiyê re, çûbû ser dilovaniya xwedê.





Piştî du rojan, roja çarşemê 28/11/2012an de, merasîmên xatirxwestina dawî bi xemgînî birêve çû, li katjimêr 14.00 li bajarê Hamburgê malbat û dostên Arşevê Oskan xatirê dawî jê xwestin.
Malbat û dostên nemir Arşevê Oskan wek wefadariya wî ya di ber çand û wêjeya kurdî de, xwestin wê wefadariyê lê vegerînin wexta nerîna dawî avêtin ser cendekê wî yê tahir. Di wê roja xemgîn de, darbesta Arşev bi ala rengîn û gulan hatibû xemilandin





Merasîma xatirxwestinê ji aliyê Mistefa bavê Çeko ve birêve çû, PDK-Iraq û Encûmena Niştimanî ya Kurd gotarên xwe di derbarê Arşevê Oskan de dan, her wisa ji malbata wî rêzdar Sedûn Oskan gotina malbatê pêşkêş kir û spasiya amadebûna xatirxwazan kir, her wiha got: Arşev ne yê me tenê bû, belê yê we û gelê kurd bû. Ji aliyên dostan ve nivîskar Qado Şêrîn bi navê dostên nemir gotinek xemgîn pêşkêş kir û got: ka emê çilo dostekî din mîna te baş li van welatên saro-germo peyda bikin lo dosto?, dîsa wî gotibû: tu çû ser dilovaniya xwedê, te giyanê xwe wek emanet li ba me hişt, emê giyanê te di nav rûpelên pirtûkên te de bi germî biparêzin.
Behiya nemir Arşev di rojên şemî û yekşemê, 01-02/12/2012an de li Bremen-Elmanya, katjimêr 12.00-22.00, li dar ket.
Xwedê nemir Arşev bi dilovanya xwe şa bike.
Bila serê zarokên wî, û serê gelê kurd sax be.

## Kurte jiyana Arşevê Oskan


(bi pênûsa nemir''P.N)



Di sala 1967 an de , li gundê Bîrkinêsê, di navbera bajarê Dirbêsî û Serêkaniya binxetê de ji dayik bûme. Li gundê me ji bilî zimanê kurdî nayê axaftin, dayika min heyanî ku koça dawî kir jî hînî zimanê erebî nebû. Bavê min bi sê zimanan zanîbû kurdî erebî û tirkî. Dibe ku ji sedema zimanê dayikê be, zimanê kurdî li cem min, tu toz nehat ser û pîrozbahiya xwe bi xurtî parast. Dê û bavê min, wek hemû malbatên Kurd bi jiyana çandinî û xwedîkirina heywanan ve mijûl dibûn, bavê min ji êl û eşîra Azîzan e, herweha gundê me ji 120 malbatan pêk tên û piraniye wan, ji mala Oskan in, Oskan bavekî mala Bozo ye, û Bozo jî, yek ji şaxên êla Azizan e.
Min xwendina xwe ya despêkê (seretayî) li gundê xwe kir û ya navçeyî li bajarê Dirbêsiyê û herweha lise li bajarê Hesiça.
Di sala 1988 an de ez ketim nav leşkeriya Sûrî ya ku bi darê zorê herkes didan ber xwe û ew dajotin leşkeriyê. Min leşkeriya xwe li ser derya sipî li ser pişta keştiyan derbas kir, li bajarê Latakiyê, başûrê Eskenderonê, heyanî 1991 ê ez jê rizgar bûm û vegeriyam gundê xwe.
Berhemên min yê piştî leşkerîye piranî helbest bûn di pirtûka min î yekem "Hêviyên Birîndar " de sala 1995 an de cîh girtin. Helbestên min yê piştî sala 1995 an, di pirtûka min î duwem de, bi navê "Kê Gul Çinî?" di sala 1999 an de çap bûn.
Lê mixabin ji ber sedemên teknolojîyê pir şaşî û kêmasî di rûpelên wan de peyda bûn. Min xwest ez wan herdu pirtûkan û ya sisyan "Awazên Evînê 2012" bikim wek yek pirtûk û bi hev re çap bikim. Ev berhem, di baweriya min de, dê têkeve nav destên gelek hunermendan û dê sûde ji wan bêne wergirtin.
Berhema min ya sisyan "Berbang Qedexe ye" di sala 2001 ê de, bi helbestên serbest çap bû, û bû yek ji weşanên kovara Zevî. Di sala 2001 de me biryara derxistina govara zevî da, ez bûm sernivîserê wê. Heyanî dawiya 2003 an 10 hijmar jê derketin û bi derketina min î ji welêt, ew jî rawestiya.
Di sala 2010an de pirtûkek min î din a helbestan bi navê ''Xewnistan'' ji weşanên Do derket.
Her wiha berî wê wextê min dest avêtibû romanê, û ji weşanên Do di sala 2010an de romana min ya yekemîn ''Keştiya Penaberan'' derket.
Niha li Elmanya dijîm, bavê sê zarokan im, du kur û keçek. Di sala 1996 an de zewicîme.
Arşevê Oskan
Hamburg 26.01.2012

## Koça helbestvanê hêja Arşevê Oskan

Mihemedê Seyid Husên



Jana peyamê hingavtime û xemgîniya kêferatê bi kula penceşêrê re dagîrkirime, li gel koça Arşevê Oskan ji kovanên dil azirîme, xuricîna lixêvên newaziyên coşdar li min sincirîne, yadîgarên şahlewendî pelmarî hestên min bûne, kenyana rûdêmê lihevhatî tucar jibîr nakim, behremendiya wî ya afirandinê bi stêrkan re pevçiniye, berê xwe ji heyvê guhertiye, çima ku para wî li evîna qedexe xistiye, çima ku li penaberiyê xewnên bê reng û deng, bê dîmen û henasên geş û gewez raçav nabin, çima ku pêwendiyên me bê nasname hevdû gerden nakin, kêliyên zor û sitemiyê ji ser singa me mişext nabin, roka xawer ji nêv taristanê keskesoran li ber sura bayê hêwa pêşwaz nakin, çima omîdên me bi gulawazên serkeftinê sertac nabin, bi zimanê yekgirtinê rêbaz nabin, mîna wezge û siparde şêwezariya mercên jiyanê bi hev re pêngavan nadin pêşbêniyan.
Mixabin keko wê jiyana aloz û kêmçare derfet nedaye, ku hest û agadariyên xwe bi têrutesel ji tere şîrove bikim, li ber têledirkên sînoran bê vîza destaneya hezînê di dilê min delûsiyaye, ji kevçika dilê xembar pakrewaniya giyanêgorbihuştî, ku hêj li xaka pîroz mîna berbanga xunavgirtînebûye mêvenekî xoşewîst, hêj ji nêv çelengiya peyva resenmîna xameyar û wêjwdost, li gel hemerengiya xwerista, welat li ser kohên çiyarêzên Kurdistanê serê xwe helmût rakiriye, mîna birîna kulîlkê ku her bi comerdî bînê li mirovaniyê biparvedikî, mîna simbilê genimyê Bîrkinêza xopan, nemaze ku li zeviyên pîtdan berz û bala xwe libadikî.
* * *
Naxwe ku jiyan rêwingiyeke demdirêje, wisa jî Arşevê Oskan giyanê xwe dabû pêş, tenha bo ku evîn rêyakoromîdan ronî bikî, û zeman destelatdariyê li her tiştî bikî, herweku xwedê jê xweş bi heman gernejîna çakbîn, hemî kul û derdên şîngiran ji dilê hemrahên xwe dûr dikî, ku tê bîra min yekser hest dibim ku dilê min hevgehîneke dixwazî, belbî birînên min û xwe pê derman bikî, bi wan tiliyên ku timî ronî diweşandin, gurzên gulan bi ser agir de dibarandin, û îro

www.arsivakurd.org

mizgîniya hevdîtinê radiguhêze civanê evra yê xatirxwztinê, herweku ji zarokî ve hewl daye, ku evîna peyvê û derbirîna azad li ser navê xwe saman bikî.

* * *

Jêmayên wî berbang qedexe ye. Hêviyên birîdar û Kê gul çinî. Keştiya penaberan û Xewnistan. Awazên evînê û govara Zevî. dê li ber dadgeha roja paşdawî tevlî cemawirên xwendevanan, di mnagirtinên pirotistêriyê de bîneriya xwe bo te bibêjin, û lêbexşînê bi nasnameya zimanê kurdî jê re bixwazin, bo çaksaziya helbestê, pêkuristina peyvê bo heman zimanê mader û afirandina wêjenivîsî, bo hevoksaziya helkefê li ser rtim û awazên evînê, em dê bi hev re bigihên heman civînê, li Bîrkinêzê cîgehê makzayînê, li nêv baxistanên bihuştê bi xaksamaniya bextewar ya bav û kalan bête sipartin, ew lezbîriya afirandinê ya çakbîn, hogirîna helkefta hevgariyane, le ekama jana salixê bêqidoş bûme yarîgeha şînenîgeriyan, di nêv xilobata sergerdanê de min jî herçar semtên gerdûnî wenda kirine.

* * *

Vêca bo serdanekê ezê sînorên qedexe bişikînim, tenha bo neryana dawî çavên xwe bi dîtina te kil bikim. herwiha nema zanim di vê bêganeya malwêran de, li ser te bigirîm yan li ser xwe, çawa ezê li ser te negirîm û tu mîna baqê nîvco bi şahiya hevdîtinê û hêsirên xatirxweztinê şanebûye, di Keştiya penaberan de eware û derbider li te geriya me, êca çawa ezê li ser xwe negirîm û bextreşiya ku bê vîza mame, nemaze ku hêj hewl didim helbesta ku te ne nîvisandiye boxwînim.

Zindarî bo helbestvanê çalak û afrênerê bîrgeş Arşevê Oskan.

Sersaxiya diya Eyaz rêhevala dilsoz û nemekdar, li gel hersê êmîşên dara wê û Arşev. du kurr û keçekê dixwazim.

Sersaxiya xûşk û birayên gorbihuştî Arşevê Oskan dixwazim.

Sersaxiya heval û hogir, kesukar û xizmên xwedê jê xweş Arşevê Oskan dixwazim.

Xweşbextiya çand, ziman û wêjenivîsiya kurdî bo afirandin û pêşketinê her dixwazim û derbasbûyî be.

Sersaxiya gelê Kurd li rojavayî Kurdistanê dixwazim û debasbûyî be.

Komara Çîk..Most 26-11-2012



## Mirina azirdanê

Di 2010 an de serdanekê çûbûme komara Çîkê. Mixabin derfetên kêmpeyda rê nedane min, ku ez û nemirê sozevîn helbestvanê hêja: Arşevê Oskan hevdû bibînim, herweku min salix û nûçeyên jana azirdana wî, ji destê pencaşêra malwêran û derziyê kîmawî ji devê wî dibihîztin, lewra naçar bûme ku vî deqê jêrgotî, bê navlêkirin û amajepêdan di bafîkê de binîvisînim.

Biborînin bera civanê me êvara înê be, biborînin berya ku hûn rewan ji min mist bikin nasnameya min, dîroka rojbûyîna minli ser kêla min tomar bikin, çunkî nema zanim
çendî temenê xwe jiya me.

* * *

Nema tê bîra min dilê min di rekeha sînga min de, li kîjan rexî lûsiyaye, bi kîjan zaravî navkutkê dikî, loma dixwazim kirasekî sipî li min bikin, guleke çênî li ber serê min daçikînin, mûmekê li jora tirba min vêxînin.

* * *

Herşev bernameya azirdanê dizanim, li ber sirûda qamçiyan dîroka çerxên çûnî dixwînim, bêgane û koromîd aşê dilê min digere, rikrika diranên min mîna destar zimanê min dihêrin, tenha ji bo kiloreke nan daran dijimêrim, ji bo pînakî di bin sîtava baranê de, bosteke axa welêt nemaze ku sirûda netewî li ser binîvisînim.

* * *

Çendî şaşî mezine dema ku yek dibêje: dikarim heyvê kefen bikim, gorekê ji rokê re bikolim, dest û lingên zeman zincîr û merbend bikim.

* * *

Gelo ta kengî şev wê li ber awazên heyvê semayê bikin, û
stêrk di hetavan de bê deng bimînin, li ber guregura bayê çilê sar, li benda ku şêhîna hespê boz li bûka wenda bigerî, di asoyên bê perav de li benda selefên siwaran, çavên xwe raguhêzin ser rojnameyê, û cîhan li deriyê çerxê 21 ê dixînî..û hêj bo siberojên nêz keziyên xwe şeh dikî.

* * *

Çima ku li hêviya hatina te me, mîna qumrîka xemgîn bi reng, deng û dîmenê xwe di dilê min de rûniştiye, hin caran ji nişka ve wêneyên kavilên wêran, zeviyên kaleşûv, deşt û çiyayên asê, jankêşana yadîgarên şahlewendî, li ber ahenga keservedanê li min dibine mêvan.

komara Çîk Teplîce 27-1-2010

## Koça helbestvanê hêja Arşevê Oskan

Jana peyamê hingavtime
xemgîniya kêferatê bi kula
pençeşêrê re dagîrkirime
li gel koça Arşevê Oskan
ji kovanên dil azirîme
xuricîna lixêvên newaziyên
coşdar li min sincirîne
yadîgarên şahlewendî
pelmarî hestên min bûne
kenyana rûdêmê li hevhatî
tucar jibîr nakim
behremendiya afirandinê
bi stêrkan re pevçiniye
berê xwe ji heyvê guhertiye
çima ku para wî
li evîna qedexe xistiye
çima ku li penaberiyê
xewnên bê reng û deng
bê dîmen û henasên
geş û gewez raçav nabin
çima ku pêwendiyên me
bê nasname hevdû gerden nakin
kêliyên zor û sitemiyê
ji ser singa me mişext nabin
roka xawer ji nêv taristanê
keskesoran li ber sura
bayê hêwa pêşwaz nakin
çima omîdên me
bi gulawazên serkeftinê sertac nabin
bi zimanê yekgirtinê rêbaz nabin
mîna wezge û siparde
şêwezariya mercên jiyanê
bi hev re pêngavan nadin pêşbêniyan.

* * *

mixabin keko
şwejiyana aloz û kêmçare
derfet nedaye ku
hest û agadariyên xwe ji te re
bi têrutesel şîrove bikim
li ber têledirkên sînoran
bê vîza destaneya hezînê
di dilê min de lûsiyaye
ji kevçika dilê xembar
pakrewaniya giyanê gorbihuştî
ku hêj li xaka pîroz
mîna berbanga xunavgirtî
nebûye mêvenekî xoşewîst
hêj ji nêv çelengiya peyva resen
mîna xameyar û wêjwdost
li gel hemerengiya xwerista welat
li ser kohên çiyarêzên Kurdistanê
serê xwe helmût rakiriye
mîna birîna kulîlkê
ku her bi comerdî bînê
li mirovaniyê biparvedikî
mîna simbilê genimê
Bîrkinêza xopan
ku li zeviyên pîtdan
berz û bala xwe li badikî.

* * *

naxwe ku jiyan
rêwingiyeke demdirêje
wisa jî Arşevê Oskan
giyanê xwe dabû pêş
tenha bo ku evîn rêya
koromîdan ronî bikî..û
zeman destelatdariyê
li her tiştî bikî
herweku xwedê jê xweş
bi heman gernejîna çakbîn
hemî kul û derdên şingiran
ji dilê hemrahên xwe dûr dikî
ku tê bîra min yekser
hest dibim ku dilê min
hevgehîneké jê dixwazî
belbî birînên min û xwe
pê derman bikî.
bi wan tiliyên ku timî
ronî diwesandin
gurzên gulan bi ser
agir de dibarandin…û
îro mizgîniya hevdîtinê
radiguhêze civanê evra
weku ji zarokî ve hewl daye
ku evîna peyvê û derbirîna azad
li ser navê xwe saman dikî.

* * *

jêmayên wî berbang qedexe ye
hêviyên birîdar û kê gul çinî
keştiya penaberan û xewnistan
awazên evînê û govara Zevî
dê li ber dadgeha roja paşdawî
bîneriya xwe tevlî
cemawirên xwendevan
di mnagirtinên pirotistêriyê de
bîneriya xwe bo wî bibêjin…û
lêbexşînê jê re bixwazin
bo çaksaziya helbestê
pêkuristina peyvê
bo zimanê dayikê yê mader…
afirandina wêjenivîsî
bo hevoksaziya helkefê
li ser rtim û awazên evînê
em dê bi hev re
bigihên heman civînê
li Bîrkinêzê cîgehê makzayînê
li nêv baxistanên bihuştê
bi xaksamaniya bextewar
ya bav û kalan bête sipartin
lezbîriya afirandinê ya çakbîn
hogirîna helkefta hevgariyane
le ekama jana salixê bêqidoş
bûme yarîgeha şînenîgeriyan
di nêv xilobata sergerdanê de
min jî herçar semt wenda kirine.

* * *

vêca bo serdanekê ezê
sînorên qedexe bişikînim
tenha bo neryana dawî
çavên xwe bi dîtina te kil bikim.
herwiha nema zanim
di vê bêganeya malwêran de
li ser te bigirîm
yan li ser xwe…û
çawa ezê li ser te negirîm..û
tu mîna baqê nîvco
bi şahiya hevdîtinê..û
hêsirên xatirxweztinê şanebûye
di Keştiya penaberan de
eware û derbider
li te geriya me…êca
çawa ezê li ser xwe negirîm…û
bextreşiya ku bê vîza mame..û
hêj ew helbesta ku
te ne nîvisandiye
min nexwendiye.

Zindarî bo helbestvanê çalak û afrênerê bîrgeş Arşevê Oskan.

Sersaxiya diya Eyaz rêhevala dilsoz û nemekdar, li gel hersê êmîşên dara wê û Arşev. du kurr û keçekê dixwazim.

Sersaxiya xûşk û birayên gorbihuştî Arşevê Oskan dixwazim.

Sersaxiya heval û hogir, kesukar û xizmên xwedê jê xweş Arşevê Oskan dixwazim.

Xweşbextiya çand, ziman û wêjenivîsiya kurdî bo afirandin û pêşketinê her dixwazim û derbasbûyî be.

Sersaxiya gelê Kurd li rojavayî Kurdistanê dixwazim û debasbûyî be.

**komara Çîk..Teplîce**
**26-11-2012**

www.arsivakurd.org

KURT û KURMANCÎ

Hoşeng Broka
hoshengbroka@hotmail.com



## Arşev ê „zû“

***Bo Arşev, piştî sê salan ji bêrîkirin û jibîrkirinê...***

Berî dora 3 salan, Arşev di e-maileke xwe de, weha silav kir: „kekê min Hoşeng silavên rojê, hêvî dikim rewşa te baş be. Tê bîra min carekê te nameyek ji min re rê kiribû û te gotibû, ku „tu bilez hatibû bîra min“ û te ew pêjin vala bernedabû. Vê gavê li min jî wisa hat, loma vê silavê ji bo te dişînim.“ (Date: Sat, 21 Nov 2009 11:24).


Piştî vê e-maila „zû“, min di bersivnameyeke zû de, ji Arşev re, ku bilez û zû çû mirinê, weha basa me, yên di navbera bêrîkirina zû û jibîrkirina zû de, kir:

„Rast e, Arşev can..jixwe jiyan tev jî wisa ye:
Ew, kêlîkeke herî mezin û zû, a di navbera bêrîkirin û jibîrkirinê de ye.
Ew, kêlîka herî xweşik û zû, a di navbera bêrîkirina zû û jibîrkirina destên me yên zû de ye.
Ew, kêlîka me ya herî mezin, bilez û zû ye,
ku em ji nişka ve, zû tên bîra hev, û zû ji bîra hev diçin,
zû destên me bêriya hev dikin, û ji nişka ve, dîsa zû di destên jibîrkirinê de, werdibin.
Erê, kekê Arşev, jiyan bi qasî ku tê bîra destên me, wisa zû ji bêrîkirinê heta bi jibîrkirinê ye.“ (Gesendet: Samstag, 21. November 2009 19:16:11).
Erê Arşev can, rast e..
em çend carên wisa bilez, li ser keviya jiyanê, bilez û zû hatin bîra hev;
zû me bêriya hev kir,
vaye îro jî, cereke din, li ser keviya mirinê, em zû tên bîra hev,
û zû jî bêriya hev dikin.
Jiyan ecacok e...
bi qasî ku zû tê, wisa zû jî dice.
Jiyan bi qasî mirinê,
mîna ecacokê bilez û zû ye.
Erê kekê min yê ji mirina zû,
jiyan wisa bi qasî mirinê zû ye.
Em jî bi qasî jiyan û mirinê, bîra bilez û zû ne:
Em, zû tên bîra hev û zû jî ji bîra hev diçin;
zû bêriya hev dikin û zû jî hev ji bîr dikin;
zu destên me diçin hev, û zû jî destên me ji hev diçin.
Em mirovên ji bîra bilez û zû ne, kekê min ê zû:
Bîra me, bi qasî jiyana me jibîrkirin e, ku bilez û zû ye.
Bêrkirina me, bi qasî mirina me, bêrîkirin e, ku bilez û zû ye.
Em jî, yên ji bêrîkirinê heta bi jibîrkirinê,
bi qasî jiyan û mirinê, bîra jibîrkirinê ne, ku bilez û zû ye.
Dibêjin jibîrkirin, ku di bîra me de, bilez û zû ye, li jiyanê namet e.
Jibîrkirin nameta jiyanê ye.
Jiyan jî, bi qasî ku nemat e, jibîrkirin e.
Kekê Arşev ê zû..
Xwezî bi qasî ku em jiyan û jiyan, xwe ji bîr dikin, hev ji bîr dikin û dinyayê ji bîr dikin, mirin û axretê jî wisa em ji bîr bikirana.
Lê bi qasî em li jiyanê bilez û zû ne, mirin li me bileztir û zûtir e.
Bi qasî jiyan zû ji bîra me diçe, em hewqasî zû li bîra mirinê ne.
Mirin bîra me a herî zû ye, kekê min ê ji mirinê zûtir

## Dr.Cuwan Heqi

**Kekê Arşev, te bi koçkirina xwe dilê me brîndar, jar û perîşan kir!**

(Ev wêne, kekê Arşev bixwe xestibû ku ew di quncika wî ya mediakurd.com de be)



Duhî, xwarziyek min ji Finlandiya telefon da û got:
-Xalo, min nedixwest ji te re vê bûyerê bêjim, ji ber ku dizanim tê gelek biqehirî!
Lê em çawa bikin, sed heyf û mixabin, kekê me Arşevê Oskan çû ser dilovaniya xwedê!
Wek ku tu tasek ava cemidî bi ser laşê min de bikî, wisa lerizîm.
Ez şok bûm.
Min dixwest di cihê xwe de bikim qêrr û hawar!
Serê xwe pêşberî vê mirina malwêran rakim,
û bêjim ez vê neheqiya te qebûl nakim!
Ev çi edalet e tu bi serê me kurdan dikî!?
Gelo ma kekê Arşev çi neheqî li kê kiribû heya ku ew tûşî vê zilm û neheqiya giran were.
Û ew ji nav me bar bike.
Hey hawar û bi sedên caran hawar!
Bi dîn û îman, şevê dî hema bêje xew nekete çavên min.
Ez qehirîm.
Giriyam.
Min di nava hûndurê xwe de kir hawar.
Ketim nava xem û xeyalên xwe de.
Min xwe bigûk, reben, perîşan û belengaz dît.
Jiyan li ber çavên min reş bû.
Û min xeyalên xwe bi girîna xwe hunand.
Û çûme heft tebeqên asîmanê Xwedayê mezin.
Û min destê xwe bi hişkayî û acizî; qehirî û lez li deriyê Xwedayê payebilind da û got:
Ey Xwedayê erd û asîmanan!
Ez Arşevê xwe bi şûn de dixwazim!
Bi dîn û îman ji vir naçim heya wî dîsa zindî bi xwe re nebim!
Vêca tu bi keyfa xweyî!
Û min got:
Ey Xwedayê mezin!
Dixwazim tu gazî ezraîlê xwe bikî û "guhê wî bikşînî" û bêjiyê:
Ey melekê min, çima te bela xwe li Arşevê kurdan, Arşevê Dr.Cuwanî daye.
Te dilê hemû kurdistaniyan birîndar kiriye!
Te taybetî, dilê feqîrê doktor Cuwanî jar û perîşan kiriye.
Agir êxistiye nava dilê wî.
Girînek bêdawî ketiye nava bîr û ramanên wî de.
Zû lêborîna xwe ji hemû kurdistaniyan bixwaze!
Û Arşevê wan bi sax û selametî li wan vegerîne!
Û careke dî karekî wisa bi serê kurdan de neyne!
Û ez,
tevahiya şevê dî li ber deriyê Xwedayê mezin mam.
Da ku Arşevê xwe bi xwe re bînim nava me.
Wek reben û belengazan li ber deriyê Xwedê heya berê sibê rawestiyam.
Û min di mejiyê xwe de soz da:
Ez ji ber deriyê te naçim!
Heya ku Arşevê me kurdistaniyan bi xwe re, bi zindî, nevegerînim nava me!

Kekê Arşev!
Dixwazim tu bizanî,
te cihê xwe di kûrahiya nava dilên me de bi qencî, zanebûn û kurdistaniya xwe ya zêrîn kolaye!
Ji vê jî, dê tu hertim di nava dilê me de zindî bimînî!
Û keko:
Xweş bizane!
Em dê zindîbûna te ji nifşekî me kurdan dewrî nifşekî dî bikin.
Dilên me dê werin û her in.
Lê zindîbûna te dê hertim berdewam be!
Ez sersaxiya malbat, dost û hezkerên kekê me, Arşevê Oskan, dikim.
Bi dilê xwe yê tejî girî, dixwazim bêjim ku ez jî şirîkê êşa we hemûyan im.
Xwedê cihê kekê me Arşev bike cennet.

www.arsivakurdi.org

# Eziz Xemcivin



## Ji bo Nazê Arşevé Oskan!!



Keça delal! Evê nameya apê xwe, li ber serê bavê xwe bixwîne…
Arşevé **Oskan**!
Bazê helbestê …Oxira xêrê be …
Min dixwest ez bihna xwe fireh bikim û guhdarî te bikim…
Lê xuya ye ji çemê xembariyê em bi hêsanî demakevin…

Hevalo! Em miletekî béwijdan, sextekar ü derewçîn in…!
Tu zanî çi qas em dijminên hev in, ji hev hez nakin…!
Di saxiyê de em gora hev dikolin…
Tu Kurdekî hezkerê Kurdekî nabînî…
Guh nede ev gotinên ko em di mirinê de li ser hev dibêjin …
Ew rûyê me ê derewçîne hevalo…!
Heman hinek ji evan kesên ko xwe li ber te….dixin, eger tu bi saxî di tengayeké de bidîtina, bi destê te nedigirtin…
Ji rewşa xwe binase! Kê ji me seredana te li nexweşxaneyê kir?
Çend şevan em ji ber serê te ranebûne…?
Bizane, rastî tehl e… Guh li nivîsên me neke, tu mirî yî, em ê pesnê te bidin…
Di saxiya te de bûya ü tu di ber me re biçûyayî me yé xwe ji ber te veşarta..
Bila me nebîne hey tiştekî ji me bixwaze…!!!
Nuha sextekaran bi te bihîst ko tu helbestvanekî hêja yî…!!!
De ne xem e birako…
Kurdek û du Kurd biçin, li bal me derewçînan bîna hev in…
Oxira xêrê be…
26.11.12
**Eziz Xemcivin**
Heyfa siwaran ko ji hespé jıyané peya dibin...
Ji bo hevalé min î helbestvan **Arşev Oskan**…
Dixwazim bêm..
Tizbiya bîranînan morîk bi morîk
di guldanka hevaltiyê de em parve bikin…
Bila çavên me bi hev re
axaftinên çivîkên şahiyê bi şêraniya dilê te
ji cihanê re biguhêzin…

# Qado Şêrîn



## Gazin…(Arşevê Oskan)

Mirin, wexta ji bîra me diçe, bi hemd an jî bê hemd em gelek gunehan dikin. Heçê mirin di bîr û bala wî de be gunehan nake.

Ji ber wê me gelek guneh di derbarê Arşevê Oskan de kirin.

Hin kes du caran dimrin, cara pêşî wexta laş û giyan ji hev dixeyidin û cuda dibin û di dûv re giyanê azad li xwediyên xwe digere, û cara duduyan wexta xwediyê giyan tune bin.

Arşevê Oskan bi salan bû ku zikêşê peyva kurdî bû, gelek ji wexta xwe ji bo ziman û wêjeya kurdî terxan kiribû, bi wî temenê biçûk dikarîbû şeş pirtûkan hin helbest hin jî roman binivîse û diyarî pirtûkxaneya kurdî bike.

Nemir Arşev tenê bi kurdî dinivîsand, ew çeka wî ya aştiyane, mirovane û bihêz bû li beramberî êrîşên dijminan ku pê gelê xwe diparast, wek ku wî gelek caran ji me re gotibû.

Sed heyf û mixabin kurdên me xwedî li Arşev derneketin, Arşevê ku hema hema jiyana xwe ji bo me terxan kiribû, ne li roja xatirxwestinê û ne jî di her du rojên behiyê de, ne nivîskar, ne helbestvan, ne siyasetvan û ne jî ziman-dirêjên civat û kolanan ên ku helwest û şîretan difroşin, mixabin hemû xwedî lê derneketin.

Me gelek caran digot: navdar, nivîskar, hunermend û rêberên baş namirin, çimkî em xwedî li wan derdikevin û giyanê wan li ser efikên dilê xwe datînin, lê wexta me helbestvan û nivîskar di merasîma xatirxwestin û di her du rojên behiya Arşev de nedîtin, me di nava xwe de got: Arşev mir.

Mirina Arşevê Oskan, hişmendiya me, mirovantiya me û biratiya me tazî kir, qurmiçand û rastiya me ya tije gemar derxist ser avê, çimkî em di wexta nexweşiya wî de û ne jî di wefata wî de xwedî lê derneketin, bi taybetî Helbestvan û nivîskarên kurd ên li Elmanya.

Mixabin me nikarîbû ji bo cara dawî dilê jin û zarokên wî xweş bikin û ji wan re bibêjin: Arşev namire, Arşev di wicdanê me û hemû zikêşên peyva kurdî de zindî ye.

05/12/2012

## BRÛSKNAMEYA PENA KURD BO WEFATA ARŞEVÊ OSKAN

Keko, bila cihê Te bihisht be!

Di 25.11. 20012an de li nexweshxaneya Elmshornê / Almaniya endamê Navenda PENa Kurd,

helbestvan û nivîskarê Kurd, kekê me Brahîmê Oskan (Arshevê Oskan)

-14.08.1967,

li Bîrknês Bashur-rojavayê welêt- pishtî nexweshiyeke giran serê xwe danî û ji nav me bar kir, …

Em bi navê hemû endam, berendam heval û hogiren Navenda PENa Kurd ji maliyên wî re, ji xizim, heval û nasên wî re bihinferehiyê dixwazin û ji wan re dibêjin, shîna We shîna me ye, chûna kekê me Brahîm em

hemû di dilêshiyeke mezin de hishtine, bila serê We û serê gelê me sax be! Her pêwistiyeke We bi me hebe, em hemû amade ne.

Arshevê Oskan, kekê delal, em soz didine Te, rêya Te dabû ser, em jê nayêne xwarê … Bila cihê Te bihisht be, keko!

Komîteya Birêvebira Gishtî – KBG

Navenda PENa Kurd

www.arsivakurdi.org

**Salihê Kevirbirî**

# Sernûser û Xwediyê Kovara Zeviyê Arşevê Oskan

## Sernûser û Xwediyê Kovara Zeviyê Arşevê Oskan: "Zevî di kovargeriya kurdî de heyamek e!.. "

*Arşevê Oskan yek ji nivîskar û helbestvanê kurdê başûrê rojava ye ku nêzîkî 25 sal in xemxuriya zimanê kurdî/kurmancî dike. Di sala 1967'an de li gundekî bi navê Bîrkinêsê ya bi ser Dirbêsiyê ve ye hatiye dinyayê. Oskan ji sala 2004'an ve li Hamburga Almanyayê jiyana xwe berdewam dike.*

*"Hêviyên Birîndar, helbest, 1995", "Kê Gul Çinî, helbest, 1999", "Berbang Qedexe ye", helbest, 2001", berhemên çapkirî yên Arşevê Oskan in.*

*Gava Kovara Zevî tê gotin, Arşevê Oskan tê bîra kurdînûs û edebiyathezan. Oskan yek ji avakar û rêveberên Kovara Zeviyê bûye ku ev kovar li nav kurdên başûrê rojava an kurdên Sûrî baş tê naskirin. Zevî, di navbera salên 2001-2003'yan de, di nav şert û mercên dijwar de 10 hejmar pêşkêşî xwînerên xwe dike.*

*Arşevê Oskan, li ser kar û xebata Kovara Zeviyê pirsên me bersivandin…*

***Ezbenî Kovara Zevî; yekem car li ku çap bû?***

Kovara Zevî, yekem car li Birkinêsê ango li gundê ku ez lê ji dayik bûme, ji dayik bû û hejmara yekem li ser du kompîter û dû amûrên çapê çap bû. Ya rast, hejmara yekem, hema bêje wekî hejmara ceribandinê bû, da ku em di wê de derfetên xwe binasin, bê emê karibin berdewam bikin an na? Me dît ku emê bikarin, lewre li ser wê binyadê, me berdewam kir. Ji sê mehan carekê, hejmarek derdiket.

***We ji hejmara yekem çend heb çap kirin?***

Bi sedema ku tu sazî û partî li pişt me nebûn, me hejmar kêm çap dikirin. Baş tê bîra min, hejmara yekem tenê dused hejmar çap bûn. Me li gor wî dused hejmarî imkanên xwe pîvandin, em hizirîn ku em bi du caran bi qasî wan çap bikin jî wê baş belav bibe. Helbet belavbûna wan jî tenê li nav rewşenbîr û saziyên kurdan bû. Her ku çû me hejmara çapê zêdetir kir. Heta hejmara dawiyê gihîşt 800 hejmarî.

***Çend hejmar derketin, weşana xwe ji kengê heta kengê domand?***

Roja ku ez, Xemgînê Remo û Îsa Oskan ku hinek xwendina wî di bikaranîna komputerê de hebû, me biryara derxistina kovarê wergirt, roja 10.02.2001'ê bû û me ew roj wekî rojbûna kovara Zevî destnîşan kiribû. Lê hejmara yekem di dawiya adara 2001'ê de derket û belav bû. Ji sala 2001 heta dawiya 2003'an 10 hejmar derketin. Sê mehî bû. Me giranî dida ser pirsa periyoda wê, ji ber ku ev pirs xemsariyeke mezin li cem xwendevanên me çêkiribû. Kovarên me hebûn ku li ser wan "demsalî" ango "3 mehî" dihatin nivîsandin, lê ji sê salan carekê dernediketin. Bi vî awayî, di nav dijwarî û awayeke nîvdizî de em gihan dawiya 2003'yan.

***Kesên tê de dinivîsand kî û kê bûn?***

Ez jî, hevalê min jî em yek bi yek li nav nivîskaran digeriyan û me berhem ji wan dixwestin. Gelek ji wan nivîskaran, bi riya telefonan, ji vê xebatê haydar dibûn. Kesên ku li welêt dijîn tê de dinivîsand. Bêwar Brahîm, Mihemed Seyid Husên ku ew jî vê dawiyê bû yek ji endamê komîta kovarê û Berzo Mahmûd, Deham Ebdulfetah, Konê Reş, Dîlawerê Zengî, Ferhadê Îçmo, Diya Ciwan, Ciwanê Evdal, Baran Baravî, Anahîta, Xemgînê Remo çend nav in ku di kovarê de berhemên wan ên hêja hatin weşandin. Helbet ji derve jî, gelek caran berhem ji me re dihatin. Heta ji me dihat me cih dida berhemên wan jî. Bo nimûne, Bavê Berzan ji Pirtûkxaneya Kurdî ya li Swêdê, Qado Şêrîn, Welîd Murad, Mistefa Reşîd, Selîm Biçûk, bi keda xwe tevlî Zeviyê bûne.




***Rêveberên kovarê kî bûn?***

Ev pirs ji bo derxistina kovarekê û arşîvkirina wê gelekî giring e. Gelek caran kes qala van tiştan nakin loma jî piştî mirina wan kesên rêveber alozî û nakokî derdikevin û dibe cihê gelek xemsarî û gumanan. Ji ber vê sedemê min di nivîseke dirêj de behsa nimûneya Kovara Zeviyê û pêvajoya derçûna wê kiriye. Ez û Xemgînê Remo xwediyê hizra derketina kovarê bûn. Heta hejmara duyem ma, paşê çû. Lê vê dawiyê Mihemedê Seyid Husên û Mîdas heta dawiyê bi min re man. Hinek hevkarên me jî hebûn li deverên cuda. Xoşnav, Anahîta, Masûd Akko. Tevahiya aboriyê li ser pişta min bû. Her wiha nivîsende û çapker jî, her ez bûm. Lê divê bibêjim ku di çend hejmarên pêşî de, Îsa Oskan alîkariya min kir.

***Bi qasî dizanim Kovara Zevî kitêb çap kirine, pêşbazî saz kirine. Ez ne şaş im ne wisa?***

Wey siheta te xweş Kekê Salih, tu rast î… Ji bo xurtbûna pêwendiyên bi nivîskaran re, me biryar dabû ku em salê berhemeke bi zimanê kurdî çap bikin û biweşînin. Lê divê ew berhem bi zimanê kurdî bûya. Wê li ser hesabê kovarê bihata weşandin. Heta sêsaliya xwe û derketina 10 hejmaran, me pirtûkên Ciwanê Abdal (helbest), Arşevê Oskan (helbest), Anahîta (helbest) weşandin.

Her wiha, ji bo xurtbûna têkiliyên bi nivîskaran re, me xwest di her rojbûna Zevî de, ango salê carekê, çalakî li dar bixin. Wekî şevên helbestxwendinê, pêşbirkên çîrok, helbest û muzîkê û xelatkirina beşdaran. Li ser vê biryarê me "Pêşbirka Çîroka Kurdî" di sala 2002'yan de çêkir. Di wê pêşbirkê de, 16 çîrok beşdarî kir. Me komîteyek ji nivîskaran hilbijart. Ji bo hilbijartina çîroka yekem, me navê nivîskar ji bin nivîsê rakir. Komîteya me ji Ismaîl Ahmed Ismaîl (şanonivîs), Xalid Mihemed (lêkolîner), Fewaz Abdî (çîroknûs) pêk dihat. Bi amadebûna 15 nivîskaran Qado Şêrîn bû xwediyê xelata yelem a çîroka kurdî. Qado, li derveyî welat dijîya, me xelat gihand destê xwişka wî Gulê Şêrînê.

***Zevî di nav şert û mercên çawa de dihate çapkirin?***

Şertên ku li ser zimanê kurdî hatibû ferzkirin, li ser ziman û edebiyata Îsrailê nehatibû ferzkirin! Ji salên serxwebûna Sûrî ji bin nîrê Fransî, ango ji salên 40'î heta roja îro heftê sal derbas dibin. Hê jî zimanê kurdî qedexe ye û nayê pejirandin. Heta ji wan hatiye kurdan jî, bi her du destan zimanê kurdî zevt kirine. Ji ber vê yekê ye ku kurdekî başûrê biçûk bixwe jî, li mala xwe bi erebî napeyîve. Rewşenbîr û nivîskarên kurd, li rojava bi sedan pirtûkên kurdî çap kirin. Zevî jî yek ji wan berhemên ku bi zorê û di bin tahdîdan de dihate çapkirin û belavkirin. Me odeyek ji xwe re cihê kiribû û hemû alavên ku mirov karibe pirtûkan çêke, lê bi cih kiribû. Ji kompîturan bigire heta meqesên ku pê pirtûk têne birîn. Me ji tirsa kontrolê, piştî her 50 hejmarî, temam dikir, me ew direvandin cihekî din. Mirov dikare bibêje ku ew ode bibû pirtûkxaneyeke biçûk.

Her ku wê hejmarek derketa hêzên ewlekariyê dihatin cem min, lê min xwe li tiştekî nedikir xwedî. Demên dawiyê tendirûstiya min nema rê dida van xebatan. Ez du caran ketim destê wan. Di destê wan de diketim rewşekî pir xerab ku neyê serê tu kesî.

***Kovar bi fermî, bi destûrî dihate çapkirin an bi awayeke nehênî?***

Di dîroka dewlata Sûrî de, bi awayeke fermî, tiştekî bi kurdî nehatiye çapkirin. Ez dikarim bi rehetî bibêjim rewşa girêdahî bikaranîna çand û azadiya nivîsa bi kurdî, ji her çar perçeyên Kurdistanê, xerabtirîn rewş, rewşa li başûrê rojava ye. Heta niha destûra belavokeke bi zimanê kurdî bixwe jî, nehatiye pejirandin. Rûpelek dikare bibe sedema ku xwediyê wê bi salan bê dadgehkirin û di zindanan de birize. Ligel ku rewş wiha ye, dîsa jî bi dehan pirtûk çap dibin. Ew jî zanin ev mafekî xwezayî ye ji bo me. Lê mixabin, heta ji wan tê nahêlin.

***Zevî çawa dihate belavkirin?***

Me li her bajarekî, endamek an dostekî pêbawer peyda kiribû. Her ku hejmara nû derdiket, me para wî jê re dişand. Bi destan dihate belavkirin. Kovar zû belav dibû, ji ber ku bêpere bû. Me heta hejmara heştan bêpere belav kir, lê piştre me dît ku nabe, icar me nîv-sîstemeke abonetiyê saz kir.

***Xwediyê naverokeke çawa bû?***

Heta ji me dihat me xwe ne dispart mijarên siyasî û îdeolojîk. Me xwest kovara me bes bi wêje, huner, dîrok û ziman bê têrkirin. Di her hejmarê de diviyabû koşeyek ji bo huner û hunermendekî/ê bê terxankirin. Di her hejmarekê de diviyabû li ser dîroka bajarekî kurdan nivîs hebe. Divê di her hejmarê de nivîsek li ser gramêra ziman û rastnivîsê hebûya. Heta ji me dihat, me dikir jî. Me beşek ji bo nivîskar û çalakiyan amade dikir.

***Tiştên ku Zevî ji xwe re dikirin armanc çi bûn? Kovarên ku dabû ser şopa wan hebûn gelo?***

Helbet karê rojnamegeriyê yan jî kovargeriyê li ser bingeh û ezmûneya dûr û dirêj bi pêş dikeve. Ji aliyekî ve ku ev pêvajo li dîwarekî raneweste, ji aliyê din ve ku bi xwe re tiştên nû, nifşên nûjen biafirîne. Li tevahiya dinyayê jî rewş wisa ye. Helbet me kovara Hawarê nedîta an me kovarên dane dûv wê şopê nexwenda, nepêkan bû, me Zevî derxista. Heta ji me dihat, me dixwest em rengîntir bikin. Carinan me dersên zimên têde diweşand.

***Niyeta te heye ku tu çapên wê jinûve çap bikî?***

Helbet ev yek gelek caran di serê min re derbas dibe. Hema bi kêmanî wekî cildekê ji pirtûkxaneya kurdî re bima, wê pir baş bûya. Jê re aborî divê. Heger ev pirs çareser bibe, ez her deh hejmaran dikim cildek, tevî şaşiyan, sererast jî nakim…

***Tu bêriya xebata wan rojan dikî?***

Çawa nakim? Karên ku mirov bi baweriya xwe bike pir şêrîn in. Karê Zeviyê ji bo min wiha bû. Zevî di kovargeriya kurdî de heyamek e. Di jiyanê de tiştên çawa ne dizanî? Tiştên wisa ku piştî mirinê min jîndar dikin û min ew di jiyanê de jî wekî name ji xwe re hilbijartine. Bêyî wan xebatan û deman ez ne tiştek im. Ew ji bo min bîranînên gelek şêrîn û dijwar in. Lê vegera wan rojan ne pêkan e…

***Arşevê Oskan, siheta te xweş…***

Xweştir!

***rojnameger@hotmail.com***

*Salihê Kevirbirî* ***2011, Hamburg***

Têbînî ji rojnamê: em hevpeyvîna ku rêzdar Salihê Kevirbirî wek orgînala wê piştî wefata nemir Arşevê Oskan diweşînin.

www.arsivakurd.org

## Arşek Baravî



### KOVIYÊ HIŞDAR..

Bîrawirî ne bi temene û îşê temen ne jêye,

xapînok ne şana zanînêye, goşişkarî bi kêrî armanca eşkere nayê.. ne mewdan û ne dirav, ne gef û ne fortên bizdandin û tirsê.. bi qasî gotina nerm û zelal û zimanê xweş.. nikarin bersiva pirseke erêna û dudiliyê bidin.

Kovî û dirinde ziyandarin, bêyî pîlan û melhezene ..afrînerên aloziyên tengavin, canaweran dikujin .. ew nêçîra wanin,ew kuştiyên wanin û ew jî kujerin..lê ew bi xwe jî ji tirsê ne dûrin,dikarin bitirsin, tevî ku ew ne hişmendin , ne hişdarin.. ciyên wan çiya û newalên(geliyên) bê sermiyanin.

Em dikarin bibêjin.. beranê kovî, kerkovî, şêr dirindeye, osek û hirç û gur û..W..T..D.. dirindene, em dizanin ku ev tev de hene,gelo mirovên kovî û dirinde jî hene…?

Erê koviyê hişdar ewe mirovê kovî û dirinde..ewe koviyê di durvê kesan de, bobelata mezin jî ewe, çiku mirov dikare li gor nasîna jîngeh û xwezaya koviyan xwe bi parêze, bi çekdariya li gor wan xwe amade bike û wan ji ser xwe vegerîne û bitirsîne û biqewrîne..çiku jîngehên wan cudane..lê wê mirov nikaribe xwe ji koviyê hişdar biparêze.. çiku jiyana wan hevbeşe, ango kurmê darê dibe ji darê û ziyan dibe yekser û rûlirû..an wê mergesatên mezin (mirov li dijî xizm û hogirên xwe) pêk werin.. an jî ew koviyê hişdar wê bibe sermiyanê deşta mirovahiyê , ango wê kesê mêşinî biçewisîne û çewtî û zordariyê di regezê mirovahiya belengaz de biçîne, lewra kîndarî roj birojê geş dibe û pênexweş û neyarên me jî a xwe di me re dibînin…

Em dîsa weke dîsa peye û kolê dîrokîne, ma ne berjewendiye ku em rê bidin kêsbazan û ew jî di nav me de xwînê birijînin , ew me riswa dikin û em jî li hev bikînin.. de ka werin em hev qirr bikin û xwesteka wan koviyên jiyana mirovî, wan qedene û nijdevanên abûrî .. pêk bînin, eve rastiya dema dernexûm,em kevirên lukumandinêne di rêya jiyana mirovahiyê dene û dema ku şerm û fedî pişk û par bû em jê bêpar û bêguneh mane.. êdî bese kurdooooooooooo.

Pir tariye reşe ev şev — stêr li asîman vêdikev
Çiyakî bi dar û kelem — ev reşa tarî gihand hev
Ku zuxurek diherike — xumîn li zinaran dikev
Zûrezûra evan guran — dagirtine ev newal tev
Hirç û çeqel tev baz didin — rovî li pê guran direv
dema şêr dertê rastiyê — yasa daristanêye ev
Ciyê şêr paytexta şahe — çi gepa xweş heye tê dev
Xak û zemîna pir fireh — xwe li mêşinan dide hev

''Di 13/11an de li ber deriyê sînema şewitî hate xwendin''.

Amûdê- 13/11/2012

## LEWEND DALÎNÎ



### MEYDANA BÊ DENG

Dîmenê te,
Liser mercên dilê min,
Koça xwe danî.
Û di meydana bêdengîyê de,
Awazê xwey evînî,
Kok kirin..
Tayê teyî nerm û xiloxavî,
Dihate ristin!
Û li bejna min,
Di hate pêçan.
Ramanên min jî
Weke tayê te
Rengîn dibûn û,
Di tevzînokê,
Peravên te de,
Lebteke bê rawestan
Dijenîn!
Kenê te li ser lêvên min,
Di rawestîya;
Û, Ziwabûn,
Bi têhnê
Rewa digirt!
Û hêwî dibû!
Germîya dilê te,
Cemeda axaftinê minî sar,
Dikuşt!,
Û memikên renga
Di hatin mêhtin,
Û şil diman!
Hin bi hin
Sînor nêzîkî sînoran dibûn,
Û, Dibûne yek!?
Weke mêkewê;
Biser damarên,
Di xwîn germîyê de;
Tu di xelîya!
Û, Tu mêşinî dibû!?
Pêre pêre
Tenhaya sînorên maî jî,
Dihatin hêrivandin,
Û talan dibûn!
Meydana bê deng,
Bêdengtir dibû,
Û ji meydanetî
Diket!?.

## Ehmed mustefa



### JI BO MAMOSTE Arşav OSKAN

Ew ne xeyal bû
Ew helbestvan bû
Ew ne xeyal bû
Ew rewşenbîr bû
Ew ne serok û ne padîşah bû

Ew roman nivîs bû
Ew ne xeyal bû
Ew xwedan dîrok û ziman bû
Ew ne xeyal bû
Ew Arşavê OSKAN bû
xwedanê pênûseke ronak bû
Ew ne xeyal bû
Dildarê zimanê xwe bû

www.arsivakurdi.org

## BONIYE - SUAD CEGERXWÎN



# Daxwazên windayî

Min dixwest
gurzek gulên nû pişkuvî
Ji baxê evîna xwe
,ji te re
Bicivînim
Min dixwest
Xetîr û findên cîhanê bi tevahî

Li ber dergehê dilê te
vêxînim

Min dixwest
Sorgul û zeryên gundê xwe
Wek berbûyên daweta
ji tere bişînim!

Min dixwest
Nameyek bi tîpên zêrînî
Li ser hest û ramanên xwe
ji tere binvisînim

Min dexwest
Kevokên aştiyê
di asîmanê jîngeha
Te de bifirînim!

Min dixwest
Cîhan tev ji te re
Bibe buhişt
Bibe ronahî ,da
Xemsariyê ji te dûrxînim!
Min dixwest û pir dixwest
Jiyaneke pir geş ¨ji tere bidarxînim
Lê mixabin,cî û warê te ji min re

Nema êdî xuyayî bûn
Helwestên te jî ,pir
veşartî bûn,ji lora

Daxwazên min,di sînga min
De,hatin pişaftin û
Bi carekê winda bûn

## Can Kurd



# SÊ HELBESTÊN BIJARTÎ

## Baxê Jînê

Eve jîn bû,
hema kin bû
Wekî xewnek ji xewnên min
Çi jîn e ev,
çi tevne ev
Gelek jar bû,
di destê min
Neyar û dost,
wekî hevdu
Dixin agir di cergê min
Dilêm sar bû ji vê baxê
Kete destê neyarê min
Berê hergav tijî gul bû
Niha mar in li dora min
Dilêm sar e wekî berfê
Ji van bêbext û kewkujan
Felek har e, wekî gurgan,
Nema cîgahê helbestan...

Eve jîn bû, hema kin bû
Wekî rêzek ji ristên min
Çi jîn bû ev,
Wekî ewrê, ku hat û çû
Li ber çavan
Ji boyî min zû derbas bû.

## Serê Kanî

Serê Kanî
Bi mêranî,
Dijî cengê û wêranî,
Serî hilda...
Serê Kanî
Bi bejna şox û pir bala
Dike xebat
Ji bo Kurda...
Du bulbul bûn
Bi hev re çûn
Serê Kanî
Çi xatûn bûn,
Gelek naz bûn,
Bi şahanî,
Ketin rê de,
Bi tolazî û nezanî,
Neyarê wan, ku dil reş bû,
Wekî maran...
Bi xefkên xwe, bi pîlanan
Di rêka wan de,
dav danî...
Du bulbul bûn,
Bi nalîn û bi fîxan bûn,
Çi xanim bûn,
Di xefkê çûn,
Ketin bendan...
Çi nezan bûn,
Wekî kewan
Ketin davan...
Serê Kanî
Ciyê dildar û bulbulan
Ewe warê evîndaran...
û çavkilan..

Belê çibkim?!
Ketin tê de
Sihirbaz û nexêrxazan
Evîndaran dikin zîndan
...û bulbulan,
Bi xapanî
Ji bo navan
...û dijminan
Dikin qurban...

Serê Kanî
Bi xortanî
Serî Hilda
Serê Kanî
Dike xebat
Ji bo Kurda...

## Dilê şikestî

Dostino,
Kî pê dizane?
Rewşa yara min çiye
Kanî bêjin,
Ew delala bo çi îro berze ye
Lê dipirsim
Herdem û gav
Karê min pir pê heye
Xencerek dil de venaye
Lew re min dil weywey e
Bejna yarê xweşbilind e
Mîna dara Sirwe ye
Sîng wekî qufka tirî ye
Lêv ji qendê sade ye
Gulfiroşa kes wekî wê nîne,
ew şehzade ye...
Rengê çavan weka piyala
Tê de xemr û bade ye

Dostino,
Gava we ew dît,
Jê bipirsin çi heye
Soz û peymana berê,
Qey ji wan tiştek tune ye!
Lê nizanim,
Navê yarê bo we bêjim,
ew kî ye!
Ger bibêjim,
Wê bibe ceng
Lew re ew yar tew niye
Ew tenê pêjn û xeyal e,
Giş wekî fantazî ye...
Tew ji bo Cankurd,
Dema eşqê tune,
ew rêwî ye...
Hat û çûna wî
Kete çerxeke har û xûnî ye
Tê de herdem hovîtî ye,
Tê de dildarî niye..
Lew re min jî bê heval im
dilê min jî şikî ye...

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîna Pênûsa Nû bi Elewiyekî kamîl re Kazim Eryaşar û Kemal Tolan

**Pênûs: Navê te çi ye, tû kengî û li kurê çê buyî ?**

**Kazim:** Navê min Kazim Eryaşar(Keleşoğlu) e. Ez di 02.07.1942 de ji diya xwe Rukiye û bavê xwe Reşit ra, li gundê Keleşaxa(Eymir) yê ku di herêma Kangal/Sivasê de ye çêbûme.

**Pênûs: Dînê te çi ye?**

**Kazim:** Dînê min Mûmîntiya Elewîtiyê, ya gelekî beriya Misilmanetiyê ye.

**Pênûs: Navê eşîr û terîqat(ocax)a te çi ye?**

**Kazim:** Ez ji eşîra Şadîa me û li ser ocaxa Pîr Cemal Abdal im.

**Pênûsa Nû: Zimanê ku te dîn û tariqeta xwe pê naskiriye(yanî zimanê we yê zikmakî ) çiye ?**

**Kazim:** Zimanê ku min dîn û tariqeta xwe pê naskiriye Kurdî ye Bav û kalên min, tenê bi Kurdî diaxivîn û heta wextê zarokatiya min jî, tu kesî ji me zêdeyî zimanê Kurdî bi tu zimanên dinê nizanî bû.

**Pênûs: Gava yek ji te bipirse û bibêje, mileti(netewî-qewmiyetî)ya te çi ye , gelo wê bersiva we çi be ?**

**Kazim:** Netewiya min, ez Kurd im.

**Pênûs: Navê welatê te çiye ?**

**Kazim:** Welatê min Kurdistan e .

Li goriya ku ji min ra hatiye gotin, berê pêşiyên bav û kalê min li Xoresanê bûne. Dûre ew hatine gundê Kirî-Bicîlî, yê ku di herêma Çewlik/Bîngölê de bû. Kalê min yê mezin Şahbaz Oğuları, ji wir jî tê li gundê Pûsasê(Yazigedigi), yê ku li ser herêma Refayê/ Ezîngan ê ye bicîh buye. Kalê min Keleş axa, li Pûsazê ji ber derebegê Kamaxê derketiye û hatiye Eymerê yê ku di herêma Kangal/Sivasê de ye.

**Pênûs: Li gor dîtina te, ola Elewiyan bingeha ola xwe ji kîjan olên cîhanê girtiye?**

**Kazim:** Min got , hinga ku dinya hêja tev av buye, di hingê de jî batiniya bingeha Elewîtiya me li ezmanan hebuye.Tê bîra min, wexta ku ez zarokbûm, hingê gelek Dedên me Elewiyan digotin, me di beriya misilmanetiyê de ji roj, ax û av bawerdikir. Elewiyan pêşîn berê xwe didane rojê û îbabet dikirin. Ji xwe em vê dîtina Dedên me yên ku hingê digoten, îro di gelek kitabên dîrokî de jî dixwînin.

Di wî wextê ku bisilmanetî peyda buye û pêve, sûniyan gelek ferman li ser serên me Elewiyan çêkirine. Îbadeta me îbadeta qirkleran e .

**Pênûs: Li gor dîtina te, çi cûdetî(ferqiyet) di navbêna Elewiyên Bektaşî û Qizilbaş de heye?**

**Kazim:** Li goriya ku ez dizanim, Elewî û Qizilbaş yekin.

Wextê ku derwêş û olzanê mezin Hecî Bektaşî Welî(1209-1271) emrê Xwedê kir û dinya xwe guhast pê ve, Osmanliyan çûn Balim Sultan ji Maceristanê anîn, dahne xwandin. Hinga ku Balim Sultan di medresên Osmaniyan de xwandina xwe qedand û şûn de, hat li ser tirba Hecî Bektaşî Welî, tarîqata Bektaşiyan li goriya desthilatdariya çêkir. Osmanliyan dixwastin bi alîkariya vê tarîqata Bektaşiyan, ya ku Balim Sultanê kurê Papazekî Maceristanê damezirandiye, Elewîtiyê tûne(xilaz) bikin.



Lewma Elewiyên ku li pey tarîqata Bektaşiyan diçûn zêdebûne û îro hêjî gelek jê dêjin, tarîqata Bektaşiyan serkaniya Elewiyan e. Lê, em Elewî tu carî Hecî Bektaşî Welî ji bîr nakin.

Osmanliyan dixwastin bi van kesayetan Elewîtiyê asîmlebikin û bidine ji bîrkirin.

Ez dikarim niha mînakekê ji asîmlasiyona Elewiyên Bektaşî, yên ku li goriya rêzaniya Balim Sultan îbadet dikin û min bihîstiye bidim.

Min bi çavên xwe ne dîtiye, lê gelek kesên ku çûne ber dergaha Hacî Bektaşî Welî dêjin:

Wexta Elewiyên Bektaşî, li ber dergaha Hacî Bektaşî Welî îbadet dikin, ew pêşîn berdaqek araq vedixwin.

Min jî li bajarê Delmenhorst/Almaniya yê, di semînareke Profesor Melîkof bihîst û ewî jî digot: „Wexta ez çûme nav Elewî-Bektaşiyên li Bulgaristanê dijîn, min dît ku ewan jî îbadetan xwe mîna Bekatşiyên li Tirkiyê, bi alkohlê vedikirin“.

Osmanliyan di pey mirina Balim Sultan re jî, Şêxekî Naxşîbendi(Nakşibendi) yê bi navê „Mehmed Said Efendi“ anîne danîne ber turba Hecî Bektaşî Welî.

Lê wexta ku Şêxê Naxşîbendî demekê li şûna Balim Sultan ma pêve, ewî dît ku baweriya Elewîtiyê ya raste, ewî jî dev şêxantiya xwe berda û bû Elewî.

Gava siltanên Osmaniyan dîtin ku „Mehmed Said Efendi“ naxşîbendî jî buye Elewî, ewan êdî zilma xwe ya li ser Elewiyan hîn gelekî zêdetir kirin.

Tekk(Dergah)ê Hecî Bektaşî Welî vekirin û çi tiştên pîroz têde hebûn, tev birin. Heta îro hêjî, ewqas tiştên me yên pîroz şûnde ne anîn. Elewî, îro hêjî bi peran, biletan distînin û diçine dergahê Hecî Bektaşî Welî ziyaretdikin. Ev dergehê pîroz, heta îro hêjî dibin bandora wezareta çandê ya Tirkiyê de ye.

Ez dizanim, îro gelek federasiyonên me Elewiyan hêja jî dahwa wan tiştên pîroz, yên ku ji tekê Hecî Bektaşî Welî hatine derxistinê dikin û wê qezanca ku li ber vî dergahê pîroz tê tomarkirin ji bo parastina baweriya Elewîtiyê serfbikin. Ama dewlet hîna jî vî dengê xelqê Elewî na bihîze û tiştekî jî nade tu Elewiyan. Bi wê qazenca ku ji ber dergahê Hecî Bektaşî Welî tomardike, camiyan avadikin ûhwd.

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîn




**Pênûs: Ji xeynî vî dergahê Hecî Bektaşî Welî yê pîroz, wekî dinê kîjan paristgehên Elewiyan di herêma we de hebûn û navên wan çine?**

**Kazim:** Belê navê hinek paristgehên Elewiyan yên pîroz wehane; Xidir Abdal, di navbêna gundê Ocaxkoyî, Dîvrikê û Kamaxê de ye. Çiyayê Ortê li gundê me Eymerê, Oklu Baba li gundê Xanê, Samut Baba li gundê Tekê/Kangal, Ziyareta Solê li gundê Daban Özü, Jan û Jûn li gundê Dahul Bazê, Gul Baba li gundê Gul Baba, Abdal Musa li Antaliya yê ûhwd.gelekî din jî di kitêba Hamza Aksut ya ku bi navê Alevi-Ocaklar de hatine nivîsandinê hene.

Lê pîroziya dergahê Hecî Bektaşî Welî, serkaniya vanên ku hatine binavkirin tevan e. Dergahê Hecî Bektaşî Welî, ciyê Heca hemî Elewiyan e.

Di nav baweriya Elewîtiyê de, gelek ocax(xwedan) jî hene û her yekê ji wan jî xwe girtiyê Hecî Bektaşî Welî ne.

Di wextê hinga ku Hecî Bektaşî Welî saxbuye de, hingê 12 ocax(post)ên mezin, her yekê ku dibin bandora Dede/ Pîrên deverên de bûne, hebûne. Sinsil(daramal)a van 12 ocaxzadehan jî diçûn digihîştine wan 12 îmamên ku ji daramala Hz.Alî/Huseyîn in.

*Kirîvê Kazim bi destên xwe vî wênê ku bi dîwarê oda wî ve dalqandiye nîşan dike û dêje, em dikarin navên van 12 îmaman jî, ji vê çavkaniyê*

*(**http://alevilikvebektasilik.blogcu.com**) bidine xwanê:*

*1. Hz.Ali , 2. İmam Hasan , 3. İmam Hüseyin ,*

*4. Zeynel Abidin, 5. Muhammed Bakır , 6. Cafer Sadık,*

*7. Musai Kazım , 8. Ali Rıza, 9. Muhammed Taki,*

*10. Ali Naki, 11. Hasan Askeri, 12. Muhammed Mehdi*

Em ji wan kesên ku ji sinsila îmam Hz.Huseyin in re dêjin, Seyîd. Seyîdên ku ne ji sinsila Hz.Huseyin bin, ew nabine seyîd.

Vêga hêjî gelek navên ocaxan hene û ez nikarim navên tevan li virê birêz bikim, lê ez dizanim meriv dikare li vê çavkaniyê "

**http://www.aleviforum.com/showthread.php?t=55968**" fêrî navên gelek ocaxan bive.

**Pênûs: Çima Elewî ji peyva Qizilbaş yê acisin û mahna vê peyvê çi ye?**

**Kazim:** - Weke ku min got, tu cudatî di navbêna Elewî û Qizilbaşiyê de tûnen û wateha herdû peyvan jî yeke. Lê, Sunî(misilman) ji Qizilbaşan(Elewiyan) acisin. Sedemê wê jî, wexta ku Hz.Ali bi Muaviyan re getiye cengê, hingê bawerî(înanc), ziman û sema(libas)ên leşkerên herdû aliyan jî yek û weke hevûdinê bûne.

Dûre ji bo ku sem(şikêl-bîçim)a leşkerên Hz.Ali, ji bîçima leşkerên Muawiyan cûde bive, leşkerên Hz.Ali, ser û milên xwe bi kevnikeke sor pêçane. Suniyan ji hingê pêve, ji leşkerên Hz.Ali re gotine, Qizilbaş(Kesên kumsor).

Li goriya ez dizanim mahneya Elewîtiyê jî weha ye:

Wextê ku Hz.Ali, bi Miawiyan re kete cengê û xelqê gelekî hiz ji wê batiniya ku Hz.Ali xwe pênasdikir û leşkerê Hz.Ali dikirin. Înca Suniyan û milet ji wan kesên ku xwe dane terefê Hz.Ali, çûn û hatine mala wî ra gotin, Ali evî – Ali beyt(hizkiriyên mala Elî)

Wekî ku min da xwanêkirin, dive em Elewî bi lêvkirina peyva Qizilbaş acis nebin û heta em pê serbilind bin. Em wan fetwa û gotinên ku miftî, xoce, mele û îmamên Suniyan, di kîtabên dîrokê û xutbayên Camiyan de dianîne ziman ji bîra bikin. Naveroka wan îbadet û wahzan tev li ser asîmlasiyona netew û Elewîtiya me bû. Ewan miftî, xoce, mele û îmamên Suniyan em Kurd berehevûdinê dane û em kirine perçe perçe.

**Pênûs: Mînakeke leystikên ku ewan em Kurd û bi taybetî jî, me Kurdên Êzdî û Elewî ji hevûdinêre kirine neyar weha ye:**

**Kazim:** -Gelek miftî, xoce, mele û îmamên Suniyan û desthilatdarên Osmaniyan digotin/hêjî dêjin: Miletê Êzdî bermayên Yezidî bin Muaviye, yê ku di 10.10. 680 de li Kerbelayê serê Hz. Huseyin jê kiriye, ne.

Ji bo ku em Elewî ji birayên xwe yên Êzdî, acis û nefretbikin, ewan desthilatdarên Osmaniyan, miftî, xoce, mele û îmamên Suniyan, bi hemda xwe navê Êzdîtiyê kirine Yezidî û baş dizanim ku tu alaqa bawermendên Êzdiyan bi Yezidî bin Muaviye re tûne.

*Bila şîn û rojiyên wan kesên ku ji bo 12 îmaman girtine, li ba pîrê mezin qebul û Xocê Xizir alîkarê me tevan be.*

Kemal Tolan 28.11.12

Min gotinên vê hevpeyvîna bi Elewiyê Kamîl re, peyv bi peyv ji ber gotinên kirîvê xwe Kazim Eryaşar girtine û wê hîna berdewam bike(Kemal Tolan).

www.arsivakurd.org

**Kemal Tolan**



## Çîrokên ku hîna ji ber zargotina Ezdahiyan ne hatine tomarkirin

### Silêman Pêxember, ji merivan ra serpêkhatî û kiryarên wan şirove dikirin

Rojekê wexta civata Silêman Pêxember geriyayî bû, zilamekî ku di postê Gur de pêçayî hate civata wî û silav da cimaata Silêman Pêxber.

Gava Silêman Pêxember ev zilamê ku postê Gur lêye dît, ewî zilam naskir û zanîbû ku Xwedê cor daniye ser vî merivî. Yanî, zilam bişevê weke merivan û bi rojê weke Gur dijî. Lê Silêman Pexember, ev bûyera ji merivên ku di civata wî de beşdarin ra ne gotibû. Silava zilam lê vegerand û got:

– De keremke, were li serê civatê ruhnê!

Zilamê mîna Gur jî gote Silêman Pêxember:

– Na Pêxemberê min, eger hûn destûrê bidine min, ezê hema li vir, li biniya şikalan rûnêm û rûnişt.

Silêman Pêxember got:

– De keremke bêje, ka derdê te çiye?

Zilamê mîna Gur got:

– Pêxemberê min, ji xwe her tişt ji we ve eyan e, hûn dizanin ku ez bi şevê meriv û bi rojê jî Gur im. Lê, ez dixwazim di vê civata we de jî bêjim, êdî ez hatime zewacê. Belkî qîza camêrekî di vê civata we de û ew bixwaze qîza xwe bide min hebe.

Silêman Pêxember ji beşdaran ra got:

– Gelî camêran dengê vî xortî hate we tevan, gelo kesekî ji we, yê ku qîza wî hatiye zewacê û bikaribe, qîza xwe bi vî camêrê Gur ra bizewicîne heye?

Yekî ku gavanê gund bû, ji nav civatê rabû ser xwe û got:

– Pêxemberê min, qîzeke min heye û ez dixwazim qîza min bigihêje vî camêrî!

Silêman Pêxember got:

– Wekî wisa ye, de hûn rabin bihevûdinê ra herine mala we û hûn li wirê biryara xwe ji hevûdinê bêjen.

Wextê Gur û gavan bihevûdinê ra hatine mala gavan, gavan mesela daxwaza zewaca Gur ji jin û keça xwe ra jî got. Dûre jin û keça gavan jî ji gavan ra gotin:

– Xwedê zane û tu dizanî. Tu çi bêjî, bila weke te be!

Gavan û pîrekê keça xwe dane Gur. Gur keçik bir û ew çûn bihevûdinê ra zewicîn. Piştî ku midetek derbas bû, gavan û pîreka xwe ketine mitala keça xwe. Ewan ji hevûdinê ra gotin:

– Em nizanin, ka Gur keça me bikur ve bir û gelo niha ew di çi rewşê de ye?

Gavan gote pîreka xwe:

– Ezê niha herim, li pey şopa wan bikevim û belkî ez wan bibînim. Lê berî ku ez biçim, divê ez pêşîn biçime cem Silêman Pêxember û xatira wî jî bixwazim.

Gavan çû dîwana Silêman Pêxember û got:

– Pêxemberê min hûn dizanin, ji roja ku me qîza xwe daye Gur, heta îro em nizanin, ka Gur keça me bikur ve bir, em nizanin ka gelo ew niha di çi rewşê de ne û ku hûn destûrê bidin min, ezê li pey şopa wan bikevim?

Silêman Pêxember got:

– Bila be, ji xwe tê herî. Lê, haşte ra vê qotîka piçûk. Wexta tu di rê de çuyî, çi hate pêşiya te, te çi dît, xwar, bi xwe ra anî, divê tu piçikekî ji wî berdî vê qotîkê û li vegerê qotîka min bînî bidî min û her tiştê hatiye serê te ji min ra bibêjî.

Gavan jî qotîka vala berda binê bêrîka xwe, ad û bext da Silêman Pêxember, ku ew vê daxwaza wî bîne cî û çû bi rê ket.

Gavan çû ha li vir û ha li wir. Piştî qederekê çû, gundek hate pêşiya wî. Pêşîn gihîşte nava bîstanekî ku tije darê sêvan bû. Wexta ewî sêvên bi daran ve sorbûne ji dûr ve dîtin, dilê wî çû sêvan û got:

– Ezê niha sêvekê ji van sêvên mezin bixwim û têr bivim.

Gavan destê xwe avête darê û sêvek jê kir. Kêrika xwe ji bêrîka xwe derxist û sêv pê kire şeq. Dûre dît ku nava sêvê tijî kurmikin û sêv nayê xwarin. Rabû li yekedin û çend hebên dine jî rihênt. Li nava hemû sêvên ku weke hevûdinê kurmî ne, ma ye heyirî û got:

– Welehî ev gelekî balkêşe, ez hew zirarê didime vî bîstanî û qe qismetê min di van sêvan de tûne.

Gavan dev ji sêvan berda û dîsa bi rêya xwe va çû. Çû dîsa ha li vir û ha li wir, heta gihişte ber gundekî din. Dîna xwe dayê , vaye dêlikeke hêja nû teliqiye û şeş-heft cewrikên wê lê dimijin, dît. Gava wan cewrikan gavan dîtin, tevan dev ji mijandina memikên diya xwe berdan û hatin reyiyane Gavan. Gavan li vê rewşa dêlika dirêjkirî ku ranabe ser xwe û cewrikên wê tên direyinê, ma ecêb mayî û got:

– Welehî, evjî gelekî balkêşe û divê ez rêya xwe ji ser wan biguhêzim.

Gavan rêya xwe li ser wan guhast û dîsa bi rêya xwe va çû. Çû ha li vir û ha li wir, heta gihişte ber çiyayekî. Gavan bala xwe da nav çiyê, dibîne ku hinek kevirên gelekî mezin ji palê çiya gêr dibin têne xwarê, hinek şijikên piçûk jî dikevine dewsa wan kevirên ku ji palê çiya gêr dibin, ew jî di cîde dibine kevirê mezin û têne xwarê. Gavan li wan dimîne ecêb mayî û dibêje:

– Welehî, evjî gelekî balkêşe û divê ez rêya xwe li ser vî çiyayî biguhêzim.

Gavan rêya xwe li ser çiya guhast û dîsa bi rêya xwe va çû. Çû ha li vir û ha li wir, berî rojavayê gihişte serê heft rêyan. Gava li vir bala xwe da derdorê, ewî ji dûr ve qesreke sipî dike dît û got:

– Êdî hindik maye ku tarî bikeve erdê û ezê niha herim îşev xwe li vê qesra spî dike bigrim.

Gavan çû, ber qesrê û li zengilê qesrê da, dît ku jinek hat derî vekir. Çaxê Gavan û jinikê li ber derî hevûdinê rihêntin, ewan hev naskir. Ewan xwe çengî hevûdinê kirin û di ser hevûdinê de kelo girîbûn.

Dûre Gavan pirsî:

– Qîza min tu di vê qesrê de çi dikî ?

Keçikê got:

– Bavo, ev qesra min û Gur e.

Gavan gelekî dilxweş bû, heta midetekê li cem keç û zavê xwe Gur ma. Piştî ku heftiyeke Gavan qediya, ewî êdî bêriya malê kir. Dûre gote keça xwe:

– Keça min, ez dixwazim êdî biçime malê.

Keçikê jî baş dît û got:

– Bila be, ezê êvarê zilamê xwe Gur ra jî bêjim.

Keçikê êvarê gote Gur:

– Bavê min dixwaze sibê vegere malê.

Gur gote pîreka xwe:

– Tu dizanî ezê serê sibê ne li mal bim. Haşte ra tu vê mifta xizna me ya zêran bide bavê xwe, bila ew bikeve nava zêran û hetanî ew karibe zêran hilgire, bila wan ji xwe ra bibe malê.

Gur dîsa serê sibê ji zû ve postê xwe li xwe kir ew çû. Hinga keçikê û bavê xwe jî taştiya xwe xwarin, keçikê gote bavê xwe:

– Haşte vê mifta xizna zavê te Gur. Ewî gote min, bila bavê te têra xwe zêran ji xwe ra bibe malê.

Gavan bi eşq rahişte miftê û çû deriyê xiznê vekir. Hinga çengeg zêr berda nav bêrîka xwe, destê wî li wê qotîka ku Silêman Pêxember dabûyê ket û got:

– De ka ez pêşîn xurcika xwe ji van zêran dagirim û ezê dûre wî sozê ku min dabû Silêman Pêxember, bînim cî.

Wexta Gavan xurcika xwe ji zêran dagirt û pêve, êdî rabû derê qotîkê vekir û zêrek xiste nava qotîkê. Hinga xwast ku derê qotîkê bigre, zêrê berdayî navê ne dît. Rabû zêrekî din berda nava qotîkê, zêr dîsa di nav qotîkê de ne dît. Rabû çengê xwe ji zêra dagirt û berda nava qotîkê, qotîk dîsa tije ne bû.

Çiqas zêran berdidê, kir û nekir ewî nikarî bû qotîka Silêman Pêxember ji zêra dagire. Gavan ji vê bûyerê aciz bû û got:

– Bi Xwedê wekî wisa ye, ez ji van zêran ne ji xwe ra û ne jî ji Silêman Pêxember ra dibim.

Gavan rabû ser xwe, qotîka vala dîsa xiste bêrîka xwe û ji oda xiznê derket. Xatir ji qîza xwe xwast û berê xwe da malê.

www.arsivakurdi.org

Hinga gavan gihîşte malê, ewî rewşa zave û keça xwe tev ji jina xwe ra da xwanê kirin. Dûra êvarekê dîsa çû şevbêrka Silêman Pêxember.

Gava Silêman Pêxember Gavan dît gotê:

– Tu bi xêr hatî ! Gelo te çi dît, xwar û bi xwe ra anî?

Gavan got:

– Pêxemberê min, ji xwe her tiştê ku hatiye serê min, min dît, xwar û bi xwe ra aniye tev ji aliyê we va tê xwanê. Lê, eger hûn bikaribin van her sê bûyerên ku ji min ra gelekî ecayib bûn, ji min ra şirove bikin, ezê gelekî dilxweş bibim.

Silêman Pêxember got:

– De ka bêje, bê bûyerên ku ji te ra ecayib bûn çine?

Gavan got:

– Başe haşte keremkin, hûn ewilî rahêjin vê qotîka ku we dabû min.

Bi serê we, gava qîza min mifta xizna zavê min, ya zêra da min û ez ketime nava zêran, ez gelekî şabûm. Lê hinga min xurcika xwe ji zêran dagirt pêve û min qotîka we ji bêrîka xwe derxist, çiqas min zêr berdane nava vê qotîka we, min kir û nekir ew tije nebû. Hingê ev bûyera ji min ra gelekî ecayib hat û min ji acizbûna xwe zêr ne ji xwe ra û ne jî ji we ra anîn. Eger hûn bikaribin pêşîn vê bûyerê ji min ra şirove bikin, ezê şad bibim.

Silêman Pêxember gote Gavan:

– Başe, de haşte re ka tu cardin rahêje vê qotîkê, herdû tilîkên destên xwe li vê axê xe û rahije axê berde nava qotîkê.

Gavan cardinê rahişte qotîkê, qotîk vekir, herdû tilîkên xwe li binê axê xistin û axa rakirî berda nava qotîkê. Dît qotîk ji vê piçika axa ku bi tilîkên xwe rakiriye tije bû.

Gavan got:

– Başe Pêxemberê min, çima min bi çengan zêr berdane nava vê qotîkê û ew hingê tije ne bû?

Silêman Pêxember got:

– Kurê min, tu rast dibêjî. Lê mahna vê bûyerê ev e, çavên merivan ancax ji axê têr û tije bibe. Çavê însan tucarî ji malê dinyayê têr nabe.

Gavan got:

– Ê pêxemberê min, gelo wateya wan sêvên sor û nava wan tijî kurmik bûn çiye?

Silêman Pêxember got:

– Lawê min, ev bûyera jî şiklê însanê vî heyamî dide xuyanî. Yanî hinek însan hene, dîtina wan jî weke ya wan sêvên ku te dîtin ne, ew meriv bi şikil û bi bîçima xwe gelekî delal in, lê nav zikê wan tije kurmin, ew timî bixezeb û bikîn in.

Gavan got:

– Başe Pêxemberê min, gelo wateya wan cewrikên dêlika ku hêja nû teliqî bû û tenê cewrikên wê hatin reyiya ne min, çi ye?

Silêman Pêxember got:

– Lawê min, ev bûyera te dîtiye jî, nebaşî û bêhurmetiya hinek zarokên vî heyamî dide xuyanî. Yanî gava camêrek di wextî de hewceyî meriv dibe û têye mala meriv, êdî kêm dê-bav dibêjine mêvanê xwe tiştê ku tu dixwazî tune. Lê hinek zarokên vî heyamî, qedrê dê-bavên xwe nagrin, şerm nakin û di pêşiya dê-bavên xwe de dibêjine mêvan, na tiştekî me tune, tu ne bi xêr û ne bi silametî hatî mala me, here ji vir.

Gavan got:

– Pêxemberê min, gelo wateya wan kevirên gelekî mezin ku ji palê çiya gêr dibûn û ew şijikên piçûk ku diketine dewsa keviran û ew jî di cîde ji keviran mestir dibûn çiye?

Silêman Pêxember got:

– Lawê min, ev bûyera jî li ser beşer, ser însan û dahna ku Xwedê çawa dide merivan e. Yanî rewşa bavê hinek merivan gelek belangaz û hejar e. Lê, heyiya hinek zaroyên wan, ji ya wan gelekî dewlementir û xweştir dibe. Mînak, te bi çavên xwe dît ku, rewşa qîza te çiqasî ji ya te baştir û xweştir bû.

Gavan got:

– Belê Pêxemberê min, hûn her tiştî dizanin û rast dibêjin !

Çîroka me li virê qediya û rahma Xwedê li dê û bavên me hemiyan be !

27.05.12 …….. Kemal Tolan

*Birayê Ahmet Yasit ev çîroka di roja 07.04.2012 de ji min ra gotiye û min peyv bi peyv ji ber dengê wî nivîsandiye.*




www.arsivakurdi.org

**Feqî Kurdan (Dr. Ehmed Xelîl)**
mirzamitan@gmail.com



# Deh tembî ji bo ramyarên kurd

**Tembiya 8 an - Beşê Duwemîn**

## Zor Zane, Devî Tifangê Mor Zane!

**Bi** qaserî ku em xwedî hêz bin, emê xwedî maf û rêz bin, a rast eve, û qet ti sûd nîne ku em bi sed salan li ber dergehên dagîrkeran istuxarbin, û rondikan birijînin, di va babetê de ramyarê îtalî Niqola Mîkyavillî di gotineka xwe de dibêje: " **Dîrok diçespîne ku pêxemberên xwedî çek biser ketin, û pêxemberên bê çek biser neketin**" (Niqola Mîkyavillî: Mîr, rû 82).

Û li dor nîvê çerxa pîstan de, mirovekî kurd bi navê (Reşo), li nav gundên kurdan, yên li deverên bakur rojavayên Helebê digeriya, û digot: "**Zor zane, devî tifangê mor zane**", digotin ewa mirovekî dîn bû, lê ez dibêjim: Biravo ji tere, apê Reşo! Bi rastî tu pendyarekî zîrek û gewre bû.

Wa binêrin! Li dirêjiya çerxa bîstan gelê me refên pakrewanan yek li pê yekî pêşkêş kirin, jinan bi dilsotî qîrîna (Hawar! Hawar!) çep û rast belav kirin, rondik wek lehiyan ji çavên wan herikîn, qare qara zariyên me gihişt dergehên asemînan, lê dagîrker qet li me nehatin dilovanî, em riviyan şikeftan, derî li me suwax kirin, em girtin û wek sewalan ajotin biyabanan, em binqûm kirin, biryara qirkirina me lidar xistin, bi balefiran gundên me dan ber topan û hilweşandin, kîmawî bi ser me de beradan.

Helbet çaxa ku dagîrkeran ev bêtaran bi ser me de dirijandin, dewletên cîhanê yên gewre çavên xwe dadimrandin, guhên xwe digirtin, ne bes wena, lê bi serde jî ewbûn ên ku çekên herî metirs û xwînrij dixistin destên dagîrkeran, karzan û pispor ji wan re birêdikirn, gelo, ma sedem çibû ku ev hovîtiya li dijî me dihat bikaranîn? Sedem ew bû ku em gelê bêhêz bûn.

Ramyarên me yên rêzdar! Da ku em bibin xwedî hêzeke gewre, ez dibînim ku pêwîste hûn bi van kar û baran rabin:

**1 - Rehberiya Neteweyî Ava Bikin:** Ey ramyarê me yên rêzdar, ti gomanî nîne di sozdariya we ya neteweyî de, lewre, pêwîste hûn ji ecindeya partîtîyê derbasî ecindeya neteweyî bin, partiyên xwe di bin sîwaneka kurdistanî de bicivînin, desteyeka serokatiyê ya bilind di her beşekî de bipejrînin, di pê re desteyeka kurdistanî ya bilind a tevayî ava bikin, da ku bi kar û barê (Rehberiya Neteweyî) di her mijarê de rabe (nêrîn, biryar, helwest); evajî bi xwe bingeha yekemîne di warê (hêza neteweyî ya gewre) de.

**2 – Gel Bicivînin Ser Hev:** Li gor lêgerînên min di dîroka me de, bê pozbilindî ez kanim bibêjim: Gelê me xwedî karînên gewre ye, dilpake, zîreke, jêhate, dilsoze, leheng û cangore, raste, kultûra dagîrkeriyê hin ziyan û lawazî gihand kesayetiya me, lê hên bingeha xwe qewîne, wa binêrin çawa ciyayên Zagros, Agirî û Toros serbilindin, her sibehê tava roja Ahoramezda hembêz dikin, gelê me jî wek ciyayên me ye, ma ku ne wena bû ya ê kaniba- ji destpêka çerxa 19 de- şûreşek li pê şûreşekê hilda?

Ramyarên me yên rêzdar! Tiştê ji we tê xastin ewe, ku hûn gel di bin siya desteyeka neteweyî ya bilind de bicivînin, kesayetiya wî ji lawaziyê rêzargar bikin, karînên wî bixin çarçewa cenga rêzgariyê û serxabûnê, eva jî bingeha duwemîne di warê (hêza neteweyî ya gewre) de.

**3 – Hêzeka Cengewerî ya Neteweyî Damezrînin:** Dgîrkerên welatê me şufîniyên serserî ne, duruşmeyên pak û gewre hildidin, lê karên qirêj bi cih tînin, qet ew nikarin têbigihînin gotina Pêxember Îsa "**Eger ku yekî sîleyek veweşand rûyê te yî rast, jê re rûyê xwe yî çepê jî amade bike**" (Incîl, beş 5, peyv 39), ew dagîrkeran tenê bi zimanê zorê bawer dikin, wa binêrn, çaxa ku Emerika çoyê xwe hejand, Seddam Husên bezî qulukê!

Lewre, pêwîste hêza kurda a lêxurîn li her perçeyekî hebe, pêwîste pêşmergên me qet çekan ji dest xwe beranedin, Morîs Roban di gotineka xwe de dibêje: "**Divya ye hêz were xuyakirin, da ku pêdiviya bikaranîna wî nîne**". (Morîs Roban: Dîroka ramanên ramyarî yên berhevdankirinî, rû 44), erê, pêwîste dagîrker serî ço di bin ebê re bibînin, eva jî bingeha sêyemîne di warê (hêza neteweyî ya gewre) de.

**4 – Dostên Kurdan Pirtir Bikin:** Li dirêjahiya 25 çerxan, dagîrkeran gelê me ji cîhanê bidûrxistin, em wek hov û diz û keleşan dan naskirin, em wek olperestên dijî kiristiyanan bi nav kirin, lê ji rex xwe de, dostanî digel gelan ava kirin, bi çek û pisporên wan em dan ber komkujiyan.

Lewre, pêwîste em va rewşê serebinîhev bikin, pêwîste em dostaniyê digel gelên cîhanê pêk bînin, û dagîrkran riswa bikin, ev bara ne tenê li ser milên ramyarên me dikeve, nexêr, eva barê her kurdeki ye, divyaye her kurdek- li ku be- balyozê gelê xwe be, hevbestên baş digel gelan pêk bîne, dostaniya wan bi hêla xwe xîne, eva jî bingeha çaremîne di warê (hêza neteweyî ya gewre) de.

**5 – Ragihandina Neteweyî Damezrînin:** Eger em di navbera çar dîwaran de rûnin, û bi xwe re bipeyivin, û li ser bextê xwe yî reş binalin û bikalin, emê qet ti sûdê bi dest xwe nexînin, em pêdiviya rgihandineke neteweyî ya jêhatî, zîrek û xedî bandor in, pêwîste ev ragihandina di bin serokatiya pisporan de be, ew pisporên zana û nêrînfireh û xwedî kurdewariyeke resen.

Ey ramyarên me yên rêzdar! wa bala xwe bidin çawa dagîrker makîna xwe ya ragihandinê di pirojeyên dagîrkeriyê de bi kar tînin, qirêjiyên xwe dikin pîrozî, lê welatê me, nasnameya me, mafên me, dixin nav diranên pîskirinê, damxa îblîskirinê lêdixînin.

Şaşîtiyeke mezine eger em di ragihandna partîtiyê de werin dorpêçkirin, em xwediyê pirojeyeke rêzgariyê ya neteweyî ne, û divyaye ragihandina me di va asteyê de be, divyaye em zanebûnê di nav gelê xwe de biweşînin, nifşên me bi kelepûra me ya neteweyî ve girêdin, rêbaz û sinciyên payebilind bi cih bînin, hest û nêrîna neteweyî ya hevbeş ava bikin, gel, welat û kultûra xwe bi gelên cîhanê bidin nasîn, dostan li rex xwe bicivînin, eva jî bingeha pêncemîne di warê (hêza neteweyî ya gewre) de.

Ey ramyarên me yên rêzdar, fylesûfê Ingilîz Con Stîwart Mîl dibêje: "**Gotina ku dibêje: Di her demê de rasteqîn xwedî serkeftine li dijî setemkariyê, yek ji derwên ku şadiyê dixin dilan lê di dîrokê de gelek mînak diçespênin ku zordariyê rasteqîn bê zar hiştiye** "( Con Stîwart Mîl Cincîl: Jo bo Azadiyê, rû 48). Û şûreşgerê firensiz Mîrabo dibêje: " **Eger civakik ji mihan hebe, helbet gurê destlatdarê wî bin**".

Erê, da ku em kanibin welatê xwe rêzgar bikin, rûmeta xwe biparêzin, gelê xwe nekin keriyê li ber diranên guran, neviyên xwe nexin nav pençên şufîniyan, divyaye em penda apê Reşo bi cih bînin: "**Zor zane, devî tifangê mor zane**".

**Daxuyanî:**

**Ev gotara roja 1 – 8 – 2012 bi zimanê erebî hatibû weşandin.**

www.arsivakurdi.org

# Welat Şêro

## Gelî Hozanvan û nivîskar û rewşenbîran pênûsan bişkînin !!






Vestîvala' 17' mîn ya Helbesta kurdî

Her sal rojek ji vê vestîvalê re di nav kurdên sûryê de heye, ev vestîval jî bûye mîna cejnekê ji gelek helbestvan û nivîskar û torevan re, û ji heskerên rewşenbîriyê jî, û heger pêknewê ji wan kesan re dibê derd û êş!! .

Sala Îsal 2012an de newekî tu salan bû, heşkere bû ne mîna salên li Xirabê reş û Mûse Gewra* bû.

Em karin bêjin komîta amedekar du biryarên durrist û di cihê xwe de sitandibûn yek roja vestîvalê 28 – 10 – 2012an de Roja koçkirina mîrrê helbesta kurdî Cegerxwînê Hessarî, biryara duwem cihê vestîvalê' Dêrika Hemko', ev bajarê kurdî yê kevin, çaxê ku mirov di celdên wîre bi rêve diçe car-carna çavê mirov li zinarê Cûdî dikeve, wê kêlîkê hiş û ramanê mirov dûr diçe û dikevê nava rêçikê dîrokêde, çîroka keçika çil kezî, karwanê ser pirra Bafê, û efsena milletekî dîrokî têne bîra mirov. Çaxê mirov li vî bajarî di rawestê û li hawîrdorê xwe dinerê mirov bi bêdengiyek hundirî xweş di hisê, û çaxê mirov jê derdikevê û li paş xwe dinerê çiyayê Cûdî mîna parêzvanekî bajar hembêz dike .

Çaxê em gihiştine nava bajêr ew wênê berê winda bûn !! û bêhna nakokiyek reş jê barî ser girtina Behzat Dorsin, tevlî ku cihê vestîvalê xweşbû, di gulîstana xaringehê de bû; silav û rêz ji xwediyê wêre, lê wêneyê wî ewrê reş ji bîr nediçû ??

Tevlî ku vestîval di salê de careke, lê gelek kêmatî xuya bûn ji wan :

Yek- ji 39 Helbestên hatin xwendin li dor 15 an ji wan bi rêk û pêk bûn, çi ji aliyê gotin û hevokê û çi ji aliyê ristinê ve, û çi ji aliyê nûbûn û kûrbûnê, tê xuya kirin ku gelek helbestvanên me guh nadin xwendin û nivîsandinê bo wilo sivik bûn û sere-sere di helbestên wan de hebû' divê Hesip berî şer têr êm bin, ne di şer tenê de' .ji ber nivîsandina helbestê xwedineke zor jêre divê.

Du-kêmbûna Helbestvan û nivîskar û rewşenbîran, didê xuyakirin ku em kurd ji tiştê baş hes nakin !! gerek bi hezaran li vestîvalên wiha beşdar bûbana .

Di dawî de vestîval bi kêmatiyê xwe ve bi xweşî derbas bû, û gelek ji armencên xwe pêk anîn, û em bi hêviya sala bê vestîvalek xweş di welatekî Azad de pêk bê.

Lê çima min bangî rewşenbîr, û helbestvan kir û min got pênûsên xwe bişkênin, ji ber hate gotin çaxê em di hundir de bûn du xortên nûhatî rahiştibûn alekê!! û em pirotesto dikirin !!? û di gotin: ew kesê di hundur de ne mêrin !! Ez bi xwe gellekî kenîm û min got : bi xwedê min bi xwe gelek qurmikê simbêla dîtin lê mêr bin ne mêr bin ez nizanim !! lê min xwest yekî me ji hêla" xerbiya " bersiva wan bide?! .

*Mûsegewra û Xirabê Reş du gundê mene li herêma Aliyane, du Salan li pey hev mihrecana Helbestê hembêzkirin, û rêcîmê bi sedema wiha gelek xortên me êşandin.

# Bêkes Têlo



## SÊ DAGIRKER

Tê bimînî nependî weke stêrka nîv vemirî, gava tu çêbû, tu di nav hembêzan de bûyî ,lê niha gava tu dimirî ,tu bi tenê yî .Hey hawr ê min o!.. ji te ,ji xwe û ji ew an dilgranim.Volqane ! ,volqan hat û tirs kete bin berfê…erdhej e!. Çavên asoyê şeliqî ne, nima berbanga sosinan dibîne.

Gava giyan di paneberiyê de werdibe,pêrgî asêgeh û avjîniya xeyalê ser deştên hemû azadilî,hişê te badide.Nima tiştek dilive di mejî de û tu pûçî pepûkî li hêviya nûqitek av bidirêjî libanda dimînî.Ew hêviya bêkes weke min bêxwedî nabetile ji berku li ber te ti stêr nemaye ji bîlî ew canêşiya ku tu jê hatiye hûnandin.Tu di nabera du dagirker an ,nûvejîna canêşa

Xakê a berdewam û peyvan de mayî.Peyvên ku xewnan li ber te vedikin ji bêriya dîroka hilwişyayî,ne ezman ezmanê te ma û ne bihara ji te re vebû.Hêjî hewara me di zivistana qûrs de xwe radayî hiştiye.


Dibe tu têbigihêjî bê dagirkirin çawaye ,lê dagirkrina şoran ,peyvan hebek bi te zor e..birako.Dengvedana wan avgula ramûsanek e ku ti tam nagihê ye,rojnama sorgulên bêrîyê ye… zarokekî ji wira dipirse?.Erê ! ew yekeke ji kûl û birînan biçûkê mino…ew hest û raman e , di sibehan de ji te re dibêje sibha te bi xêr û di şevan de kezeba te cegerperitî li ser maseya Koran divezilîne.Dihêhle tu her sibeh rabigihînî ku duwa roj ezê ne êşim xaxaxaaa gerek tu bizanîbî ku ew ji poxên şevê ne û bêdengî evîn e ji wan re…ew dengvedan lalan e.

Ev tu çima wisa li min dinêrî? Hebek dî tê ji xemgîniyê serxweş bikevî.Bizanibe !.. ku ti kes nikare şîniya te bişo ji bîlî tu..Ticar li benda nemîne ku firmsikên pêlên deryayê ewê karibe ji te bêriyê barbike. Ji çerxê re û ji şikestinên wê re bêje ,hêjî ez xûlamê sûrgunê me lê ne westyam e ji ber fêrî zimanê berxedanê bûme ,ku hemû zimanan li ber laldibin.

Birako ! wa hawrê mino tu dizanî ku dagiryeke hew jê aloztir a sisyan li ba min heye .Tu nima li ber min qala navê rêber bilêv bikî ,ezê ji çermê xwe derkevim û ezê bibim Drakola ha.Ne rêber û ne rêbero û ji xwe Rêberên me li Rojava haho ,hahhooo…kî bixwaze nexwaze ,tawan barin di vê kêlîk de ku pêwîste lêv û çermê me nêzî hev bikin.

Ma ewê çi bibe ger Qubad ji gora xwe rabe û me bike destek? Û ala Mîdya weke zîngila namûsê lêxe ,belkî pozê me bişewite.Ma bû çi ,tenê bi ser me de sawîra xewê xwe dirêj kirye…. ezbenîno gava wêran bi ser mirovan werdibe ,can û giyanên wan pûç û balûle dibin û ji dîwarê hawirdorê direvin .Diçîde çavên xwe li serkirdayetiya xwe digerînin ,pêwîstiya wan bi strana rêberan heye.Hey ez nabêjim xarîzma(karîzma) em vê zanin ku ne birayên me yên mezin û ne neyar rê nedan me em vî ocaxî biafirînin ,lê bi kêmanî li ser qada xwe bin.

*Qubad rêberekî şareza ku hemû êlên Mîdya bi yekîtiyeke xûrt wan li hev civandin.



HUNEMEND

SERWER ELWANÎ

www.arsivakurdi.org

## Ez û pênûsa xwe



**Narîn Omer**
narinomer76@gmail.com

### Pênûs a min

**Tembûr**
Hişmendiya hunermend vedihûne

**Bilûr:**
Cinava şivan dirês e

**Landik…**
Rojbîniya doza jinan li ser pêlpêlokên
rondikê dayîkan vedixwe

**Pênûs a min…**
Di girêdana hebûn û nemanê de
Dastana dîdargeha me dipêj e.

**LAZGÎN DÊRÛNÎ**



### Mehrecan û şoreşe

Divim bêjim gelî dost û hevala
Ne tiştekî rijî yan pûç û vala
Sal di bûrê ev roj nav û nîşan e
Rist û helbest pêşberkî mehrecan e
Dil xweş bikin îro cejn û şahiye
Nav û nîşan ji bo me şanaziye
Lê divê em ji bîr nekin şoreş e
Seranserî welat agirê geş e
Rijêm îro li gel bûye gurê har
Dev bi xwîn bû jê di kujê bê jimar
Qet napirsê ev zaroke yan mendal
Ji berêve çi ciwan û pîr û kal
Top û firok pêre leşkerê giran
Êrîş dikin xelkê malê xwe berdan
Gund û bajar mehdemîn wêrankirin
Bi melyona bê cihû bê warkirin
Li kolana li çola man der bi der
Li welatê xelkê bûne penaber
Zarokê bê guneh birçî û tazî
Li cîhanê dikin hawar û gazî
Çav li rê ma divin wer in parastin
Lê biryar û helwest lawaz û sistin
Mixabin çare nîne rê girtîne
Tenê bo azadiyê qelen xwîne
Soz û peyman ji vê rê veger nîne
Belê armanc serkeftin û mizgîne

**BASIL HUSSEIN**
abobassam1973@hotmail.com



### welat û Şoreş

welatê min gelkî xweş e
cihê wî bilinde geş e
çiya û cobar û qeş e
têde hene kanî reş e
petrol û gaz û kareva
cihê bilind xewa şeva
têde hene bûk û zava
tiştek nagihê ber deva
dijmin dibê hemû tiştî
mirov hejarin bi giştî
gelek kuştin bi wî xiştî
da birevin biwî keştî
hin kes mane cihê kala
wan zehmet bû cihê bala
polîpoşman bûn wek lala
dest wan neket karê şala
ên koçberbûn çûne derve
rewşa wan xweşbû biserve
nehêl hat lê ew ji derve
koda wan tije bû serve

destpêkir şoreşa sûrî
rêjêm çavsor bû dizûrî
digot qirkim zar û zerî
zêç û kal û pîr û perî
hinek pêre bûne tebak
nijadperest digotin hak
dê nehêlin çêlî û mak
ewte ewta wan bûne sak
kesê dijî rêjêmê bûn
xortên zana divan hebûn
azadî dadî serxwebûn
slogan digotin bi harbûn
berdewame şerê giran
Êran, Rûsî, Sîn wek keran
dibîne dirûxe seran
dewletê bê dad û goran
dawiya şoreşê xweş e
dê bihele gelek qeş e
dijmin derkeve bimeş e
nema bînin xewne reş e

**Ebdilsemed Mehmûd**




helbestvan-98@hotmail.com

### Tirsek

Li ser siya xewnekê
nivîsîbû
birakujî
li derî dide...
çivîkek diponijî
ji tirsa ko vebe....
di qermîçokên kalemêrekî de
keser digindirîn
zeriyekê....
bi biskên xwe

asê dikir
ji tirsa ko vebe….

ko vebeeeeeeeeeeee
ma gelo ?
wê çend maç bi şewitin
çend sîng talan bibin
çend rê û rêçik nû bibin
çend şap berê wan li me bin
dê min bikin e gorî

bila ew tu car venebin

**Azad Ramadan**
aind2011@gmail.com



### Ey lawiko

Ey lawiko ti pir ciwanî
ti hem derdî hem dermanî
çi xwortekî pir delalî
herdem û her gav ti şêrînî
lawiko çima xwe dûr dikî
ez im gul im gul nisrîn im
keskî ji te pêva nabînim
ezi m Xecê û gulê û zîn im
ez heleza li nav berfînim
lawiko wera li min binêre
carkê wer bibe mêhvanî

gulek geşî li nav baxanî
ji canê mira tu semyanî
qam û qulafet tak rihanî
baxek ji baxê evînî
tu dilê min birîn dikî
ez melhema li ser birînim
di evîna te de har û dînim
xwe dime kuştin ser te dînim
sipî zerim sor û şîn im
hezar carî mi digo were
ji ter pêşkêşkim rih û canî

www.arsivakurdi.org

# Mihmedê Qadirû

### Diyarî bo helbestvana hêja û bi nav Bêwar

## Bêwar

Ey Bêwarê slavên min li wî canî
bêgumanim helbest av bin tu yî kanî

Di vî warî de sînordaşa melê Xanî
Cegr xwîn çû, te çinarek li şûn danî

Tu keçeke bi ramanî, aqilmendî
peyv bi sazî, meqam kurdî, nehawendî

Rojên tarî tu birûskî, mûm û findî
nivîskarî, nexşevanî, hûnermendî

Te barekî pirî gran danî ser mil
di guha de, tu dixwînî rengê bulbul

pîzotê ar tihnê nadî, ku bû tîfil
welatên bê xwendevan dibin kavil

Ey Bêwarê tu jî wek min, birîndarî
welatperwer di hinav de pêt û arî

Lê behwerke, wê roj dûrkin şevên tarî
wê barana azadiyê li me bibarî

Qamşlo 2007

## Gazî

keça kurdî xwe nas bike
lêvên pembe tu sor neke

wan çavên reş kildan neke
wî kildanî jê reş neke

Muwa ji burha raneke
heyva sermeh tu rast neke

Wan mijanka ji hev dûr neke
gulyên marî xelek neke

Wê gul avê bi xwe daneke
wê gul bihna te li xweke

Rojê bi wan wida neke
xemla kurdî li bejna xweke

Bi fêrkirin xwe berz bike
xwendin mirov bilind dike

Riwên keçan sipî dike
ji şivanê kurd behwer bike


Qamişlo 2003

## Hunermend SERWER ELWANÎ



# Amer .x. Murad

amer.x.mourad@gmail.com



## Poşmanî

Di gornê feqiyé teyra û te go di dilê mede yek agire
Di qubletin û mi go cilka mi ji aliyê te jî na guhere
Di dilê me bûn lê bûbûn yek û jan û kul warê wa yek devere
Di dil bûyî û di nav evîn û poşmaniyê de li ba te şere
Lê te dil hişt bi birîn û bi waweylê gava te gote min here
* * *
Poşmanî gelek zore ne hatiye gotin ta qada çarçira
Berbang raza û şev tariye lê zanim aso li me dorgire
Her carekê gul tê bênkirın ji tirsa mirinê ta digire
Gul neman û zembîl firoş nema vala li kolana digere
Darbesta min westiya ji milê te bese deyne û vegere
* * *
Zînê rahişte kêla xwe tenê û barkir ji ba gorna mem
Xaka xwe vegerande jor katjimêrê û windabû ew dem
Pêlê dawî bi darvekirin û ji kewser xeyîdî zemzem
Tê bîra te payiza pêşî hatî biser buheşta bi xem
Lê mixabin îro ti poşmanî û robar nebûn kale çem

# F. Yakoub



## Barana eşqa te

Tu barana payîzê
Bi rûkê erdê dilîzê
Bêhna xaka min ji te tê
Deşt û newalên behiştê
Kulîlkên dilê min geşbûn
Bi bêhna barana te
Baran li ser min barî
Şeva dirêj û tarî
Ewir û dûman û xumam
Li bin baranê ez mam
Dibe ez bêm şûştin
Ji guneh û ji sûcan
Tu tava heyva min î
Di şevên min ên tarî da
Tu hêviya min î
Di şevên bê hêvî da
De carekê tu were
Dîsa dest pêbikin
Ji serî da

www.arsivakurdi.org

Mizgîn Hesko



# ŞIKESTINA BASKÊN ASOYÊ

## ( Lêgeryanek di nav baskên Romana Meryemayê de, ya romannivîsê kurd Sebrî Silêvanî )

Bêguman, Roman ,ji pêwîstirîn alavên ragihandina hişmendî, derûnî, felsefî, û avakirina giyanên bi rêk û pêk in.( Giyanên di asta pûnijînê de) Herwiha ew ji pêdiviyên civakê ne…di asoyên wê de Mirov dikarî dest bi firîneke azad û aqlan e bikî û di nav tireh û mêwan de, ji xwe re hêlîneke germ , û aram bipejirîn e..bi wata mala mirovahiyetê, ji bo bilindkirina hest û nestên mirovn e, û avakirina mercên wê yên nirx buha ku divê Mirov dest bi xwe bikî,,ku di hinavê xwe de, di hiş û ramanên xwe de azad be, Mirov be.

Romannivîs ,yê xwedî helwest, dikare bi vegotina xwe ya çalak û aktîv, vî mercî pêk bîne …ne nivîs ji bo nivîsê, lê ji bo avakirina Mirovekî durist û pak, ew dikar e bi hemî alavên xwe pirsan arasteyî xwêner û civakê bike,helbet dê li benda ti bersivan jî nemîne…ta radeya ku civak û xwêner wî Peyamber bipejirînin.

Ma nivîs ne peyam e..?

Hêdî, hêdî Kurd jî dibin xwedan Roman û Romannivîs, û ji wan jî hin xwedanên xameyên herikbar , şaristanî, û çalak. Ji bo guherîneke berbi , baweriyên û helwestên paktir, duristir ve, berbi ronakbîriyeke geştir û kûrtir ve.

Ji Romannivîsên me jî, mamostayê birêz Sebrî Silêvanî, ku ji bilî helbest û hin lêkolînên hêja çend Roman jî afirandine, ji wan :

Ava mezin-kêlîka ku Masiyên xwe tî dihêle-2004.

Bîst sal û êvarek 2004

Meryema-2007.

Sîfra Silîvî 2010.




Helbet ne lêkolîner im, lê Meryema ez Jin ( Mirov ) berbi êşên xwe ve birim, berbi arîşeyên dijwar ve kişandim,
Meryema – yan jî Keçejinek ji zemanekî din wekî ku Romannivîs ew wiha şîroveke kiriye, daye nasîn û binav kiriye .
Meryema- yan jî Erxewana (gul hinar ) ku di payîzê de na giha bibe Hinar yan jî şikestina baskên asoyê wekî ku ez ê wê şîrove û binav bikim.
Meryema ji nav û bi şûnde, herwiha û bi dîtina min, ev nav ne ji ber xwe ve hatiye ; xwe feriz ne kiriye li ser Romannivîs, lê belê wa diyar e ku ew î ev nav bi pîlan û tektîk hilbijartiye Gelo çi têkilî dinav bera Meryema Sebrî Silêvanî û Meryema dayika pîroz de heye ........?

Ev ê pirsyarê ez ê li vir li qelem dim û incax xwêner û di hiş û giyanê xwe de wê bibersivîne!

Meryema û di civaka rojhilatê de , tekez ne diyarde ye…nemaze ku em bizanibin ku her sal hijmara Jinên xwekuj û yên tên kuştin, binaxkirin û tawanbarkirin her û her zêde dibe û kêm nabe. Bi herhalî jî ew ne rewşeke awarte û cuda ye, ji mêj ve , ji dema ku Jin ji textê Xwedawendiyê hate daxistin ew li rasta pirsgirêkan û çewisandinan hat… sedemên vê têkçûnê jî pir in , bêhijmar in ji wan jî bêhêzî û bêgunehiya zaroktiyê,SADIYA mêrên rojhilatî ku her û her ne xursen din , her yek Impiratorekî di hinavê xwe de hîs dike, paşketina civakê bi xwe, ragihandinên olî yên bê rêk û pêk „ku piraniya mêran wan çewt û li gor berjewendiyên xwe şîrove dikin , perîşanî, xinizî, lixwedî derneketina desthilatdarê û qelsiya jinê bixwe û nezaniya wê ku pirê caran, jin bixwe serê hev dinukilînin ,hev tawanbar dikin û dibin daqoqên serê regezê xwe û hwr.

Meryema a sî û şeş salî li raberdû vedgerê , ne ku vedgerê . ma kînga êşên wê tên jibîrkirin, lê ew wan xemên dijwar ji Narînê re , ji hevaleke dilsoz re vedibêje

„ Mirinê dayika min, ji min stand û Mencolê jî bavê min „…R27

Hîna sêzdeh salî bû , gava ji layê Berazekî bi rengê Mirovan tête tecawizkirin, û hêviyên wê yên keçkaniyê têne serbirrîn, xewnên wê têne sêdarkirin . Meryema di oqyanosên xwînê de nuq dibe ,lê ti kesî dilpak li hawîrdorê xwe nabîne, tevî felekreşiya xwe jî, bê deng dimîn e..ma helbet dê kî li wê û li êşên wê xwedî derkevê, kî dê hevalbendê zarokan be û dê çivîkeke sêzdeh salî

Ji davkên tolazan derxîne, dê kî wê xalxaloka temen biçûk ji tevna pîrhevoka jinbavê rizgar bike.

Kî dê wê ji nav penc, sihrebazî û tolaziya Kabirayê ne Mirov derxîne…..?

„ Erê , kî rêk da Kabirayê û hemû rêk li ber min girtin, kî hêz da wî û ez bê hêz hiştim „R40

Li vir ne bitenê Mirov û kelogirî li rasta êşên keçekê tê, lê mixabin û bigiryaneke bê rawestan pêrgî şikestina ast û normên mirovahiyetê, têkçûna Welatekî, çirandina perdeya keçîniya Welatekî ku keç û kurên wî ji neçarî xwe di himbêza wî de biyan hîs dikin û di nav bagerên havîbûnê de semaya mirinên sedsala bîst û yekê dikin.

Kî bersivan bide, gava ku bêhna sirgûnê henasegeha min tijî dike, perdeya tenhistanê diqetîne, derdeseriya demsalên bê daw dighîne radeya bînahiya du çavên qerimî, asoya derûnê vedimirîne û agirê dojehê tê de hildike ? „ R52.

Gelo ew Welatê ku Sebrî Silêvanî wî dinerixîne çi Welat e û çima asoyên zelal û vekirî têde nîn in, çima şemalokên wî vemirî dimîn in…..?

„Ev parçe ax rizgar bû, belê ev parçe Mirov hîn jî dagîrkirî maye „R66.

Gelo çi têkiliyên rewanî di navbera Romannivîsên rojhilatê de hene…ev eger em bizanibin ku rojekê û

di Romaneke xwe de; Romannivîsa Ereb Ahlam Mistexanimî jî dibêje:

„ Welat,…? çawa me ew (Welat) binav kir, ev ê ku di her goreke tê de tawanek heye, di her nûçeyekê de, kederek heye.

Welat....? çi Welat e, ev ê ku me dixwest em ji bo wî bimirin û va em li ser destên wî dimirin”

Erê ... têkilî heye, ku em hemî jî neviyên vî rojhilatî ne, neviyên havîbûn û sirgûnê ne..........!

Meryema, naxwazê cîhanê biguherînê û ya rast ew vê yekê divê, lê berbi mirovahiyetê ve û bilindkirina atmusfêrên wê, lê Sebrî vê yekê li ser zimanê Meryema xwe na bêje.

Ji ber ku û bidîtina Meryema cîhan bi xwe diguherê û bi ser vê yekê de ne berbi pakbûnê ve lê belê berbi herimandinê ve. Bi herhalî Sebrî divê û bikêmanî cîhana xewnên sereklehenga xwe biparêze.

Meryema ... li vir û wir nerîn û boçûnên xwe di derbarê civaka mêran û desthilatdarê de dest nîşan dike û vekirî bi wêrekiyeke balkêş dibêje, çawa be jî dîse civak kesên yan jî bûnewerên mê na hebîn e, nemaze ku em bizanibin ku barên wan girane û civak bi giştî berbi nêrbûnê ve dibeze û heman civak jibîr dike ku regezê mê yê ciwan û afrêner , bi wata nîvê xwe li paş pencereyên tarî veşartî û girêdayî dihêle.

Gelo çawa dayikên şikestî dê nifşekî şikestî nêr û mê bi xwedî nekin, çawa ew afrîdeyên girêdayî û dîl mayî dê refek ji balindeyên azad perwerde bikin..?

“ Narîn, naxwe , em keçên kezî kur çi bikin...? R13.

Meryema ku ji havînê hez dikir, lê ji sêzdeh saliyê de, havîn jî li ber sar bûye, havînê ne dikarî li hember hêza bawerî û hezkirina wê xwe ragire....ji lewra û ji nuh ve ew li demsala pênçan digere....û li pêrgî wê jî tê, di rêka Hunerê de...Hunera şêwekarî ku di kavilî de birîn ne bi zimên tên gotin; lê bê reng û bi reng ji dayik dibin. Di Hunerê de jî têgihên nuh , serdestiya hest û nestên rasteqîne, displînên mirovan e., parastina xewnan, teybetmendiyên ademîzadan, sozdarî, cigersozî , rastgoyî, ne duriwîtî, û peydakirina zagonên şaristanî, ne ji bo Mirov bi tenê lê belê ji bo parastina lawiran û jîngehê jî.

Belê Meryema kavilan nîgar dike û di wan de jî şikestina baskên zaroktiyê vedibêje, lê di heman katî de, Huner asoyên berfereh tijî hêvîkulîlkên rengîn li ber vedike. Ji lewra pirê caran û da ku

www.arsivakurdi.org

ji hin hestên havîbûna giyanî rizgar bibe ,ew di

xelwetgiha xwe ya sawêr û aram dimîne lê dibînê ku ew jî ne tim hêlîna herî sozdar e. Mayina di paş dîwarên qalinde ne çareseriye.

Mereyema êdî bi kavilên xwe di Pêşengan de amade dibe, ma dilê wê dê raweste....?

Helbet na, lê her cara ku gupgupa dilê xwe dibihîze , careke din li rasta şikestinan tê ...ma kî gotiye ku dê dîmenê azaran bi dawî bibe.,....?

Destpêka firînê, li rasta Hejarê Pêşmerge tê , ku ta radeyeke baş, xwedan karîzma ye, lê hêdî hêdî têderdixîne ku ew bi xwe jî ne samanê xwe ye, lê li saman , milk û amlakan digerê ..!

Piştî hejar ew di Pêşengehê de pêrgî Islamê komînîst tê ( li vir jibîr nekin mebesta Sebrî Silêvanî û van navên awarte ku hin agahiyan radihghîn in ).

Islamê komînîst jî xortekî spehî, çav şîn û ji hezkiriyê tabloyan e... bala Meryema yê dikişîne û jê hez dike, lê ew evîn jî û ji ber hin têgihên mêran e têk diçe û Islam di jiyana wê de ku bi hevokeke seyr destpêka dîroka wê bi xwe re dinvîsîne , lê careka din bi hevokeke dîse seyr dawî li evîna pîroz û nirxdar tînê.

Kesê din jî Hawarê Islamî ye , ku ji xwe dê li hev nekin. Ew di riya xwîşka xwe re wê nas dike û jê hez dike lê qet wê bê desmal, nimêj û rojî na pejirîn e, û her dixwaze ku her tiştên di Pirtûkên pîroz û di Sunetê de, careke din di derhêla rojan de , ferz û peyrew bike.

Û dawî ew li rasta evîneke pak û durist jî tê , li rasta Kirmanc ê kamîrevan , û piştî ku ew ji hestên xwe ji bo wî piştrast dibe , daxwaza jiyaneke hevbeş û bihevre dike , lê li wir jî û mixabin ew xewn dihilweşe ....Kirmancê nikarê wê mehir bike, ji ber ku ew jî ji qurbaniyên şerê birakujiyê ye û birîndar e (êdî ne ma mêr e )

Û dawî çi Meryema...?

Û li vir Roman bi dawî dibe , lê Meryema pirseke vekirî , li benda çareseriya xwe di hiş û giyanê civakê de dimîne...lê ma ta niha me çend Meryema û çend Kirmanc hene...?

Me kurdan , ta kîjan radeyê dest daniye ser birînan....û eşên miletê xwe veguhestin e...?

Bi herhalî , û hêjaye gotinê ku Meryema bi rewanbêjeyekê , bi hişekî dewlemend û vekirî hatiye ristin, bi hizirbîriyeke ronak û herikbar herikî ye. lê Meryema dê hîn jî bi niqtepirsê bi dawî ne be, dê Romanek bi tenê hêsrên wê zuha neke.

Gelo çima rêzdar Sebrî alîgerê hemî Meryemên kurd û rojhilatê, û di dawiyê de dixwest dawiya wê bi wî rengî bi dawî neyênê...?

Gelo çima Romannivîs wiha Meryema xwe ji pêsîra êşê ku ji vexwarina azaran ew firşik bûye, wê careke din berbi himbêza şikestinê ve sernişîv dike û careke din lê xwedî derdikevê û wê dilekî bijen di nexşeya hebûn û nebûnê de saz dike..?

Helbet û bidîtina min ew î her û her dixwest hevoka zaniyarê cîhanê Lîster Word dupat bike :

“Ew diyarde û bi tevahî a ku pakbûna regezê nêr li hember regezê mê dibîne,xapîn e û şerm e di aniya mirovahiyetê de “ L.W.

Gelo kî jin a Xewdawend û kînga ew ji textê bilind daxist û ew perî ya basik şikestî gevizî di nav leylan û moranê de hêla...?

Ma mebest çibû ji sêva buhiştê....?

Gelo kî zagonên rojhilatê dane çêkirin ...?

Û dawî .min divê ku di bîreweriya xêneran de û nemaze rewşa jina kurd a vê gavê bi evan pirsiyaran jî bijenîn im:

Hêjayan, ma Meryema Sebrî Silêvanî a duh ne heman Meryema me teva ne, mebest jî ev Meryema ku niha li bakur , mil bi mil li nik Şêrê Meyrê..! û li serê çiyayên bilind, dinav berf û bahozê de pişt girêdayî û rext û çek di destan de ,doza welatekî azad û buhiştîn dike..?

Ma ne heman Meryema ye a ku niha di zîndanan de û di gerva birçîbûnê de baskên azadiyê diferidîn e...?

Ma ne heman Meryema ye a ku niha li rojhilat tête sêdarkirin û kevirbarandin.....?

Ma ne heman Meryema ye a ku niha û piştî desthilatdareke fîdral û xuro kurdî tête çewsandin û bi navê namûsê tête binaxkirin jî....?


Û ma ne heman Meryema ye a ku niha li rojava û li Serê Kaniyê û dibe spê li Tirbespiyê yan li Qamişlo yan Dêrikê, Kobanê û Efrînê, malwêran bibe û gurên har û dev bixwîn destdirêjî bedena wê a pîroz bikin...?

Û çawa Romannivîsê me yê hêja dixwest wê bi dawî bêne û ne dibû.. .pirsên min jî dê bi dawî nabin.!

Ji dil û can ez Sebrî Silêvanî pîroz dikim û daxwaza serkeftinê jê re dikim.

Mizgîn Hesko

15 ê Mijdara 2012an




PÊNÛSA NÛ
Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê

**Sernivîser**
**Qado Şêrîn**
**Rêvebirê Nivîsînê**
**Arşek Paravî**
**Desteya birêvebir**
**Pîr Rustem**
**Silêman Azer**
**Ezîz Xemcivîn**
**Abdilbaqî Huseynî**
**Lawîn Şêxo**
**Derhener**
**Xorşîd Şûzî**

**Ji bo hinartina berhemên kurdî:**
**kurdi.penusanu@gmail.com**

www.arsivakurdi.org